Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1333 | 14-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Rengên tabloyên wî çîroka wî vedibêjin

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Wênesazê Kurd Elî Abdullah bi rêya berhemên xwe wêneyekî hunerî ya kûr a jiyana Kurdan pêşkêş dike û hûrguliyên xwezayê û mirovahiyê li ser bingeha zelalî, aramî û felsefeya ceribandinê, temsîl dike.**

Hunerên bedew yek ji girîngtirîn qadên ku nasnameya gelan û dîroka wan a çandî diyar dike. Di vê çarçoveyê de, navê wênesazê Kurd Elî Abdullah wekî yek ji hunermendên ku karîbû bi rêya karanîna tevlihevkirina rengên avî dîtinek dîtbarî ya cihêreng pêşkêş bike. Ji ber ku xêzkirina bi rengên avî yek ji hunerên herî hesas e û ji bo kontrolkirina têkiliya av û reng li ser kaxezê jêhatîbûnek bilind û sebirek dirêj hewce dike. Abdullah bi rêya berhemên xwe wêneyekî hunerî yê kûr ê jiyana Kurdan pêşkêş dike û hûrgiliyên xwezayê û mirovahiyê bi şêwazekî ku li ser bingeha şefafî, aramî û felsefeya ceribandinê ye, temsîl dike.

Şêwekar Elî Ebdulah ku ji zaroktiya xwe ve dest bi hunera şêwekariyê kiriyê, bi firçeya xwe xweşikbûna xwezayê pêşkêş kiriye, dema tu li wêneyên wî dinêre tu ne bes xweşikbûna xwezayê dibînê, ji ber di nava wê xwezayê de nameyên wî yên taybet hene ku dixwaze bi riya tabloyên xwe bighînê temaşevan.

### Rengên av dîtinek zelal hewce dike

Her çend gelek hunermend boyaxkirina bi rengên avî wekî teknîkek dijwar ji ber leza wê û hesasiyeta wê ya li hember herikîna avê dibînin jî, Abdullah wê wekî cîhek azad ji bo ceribandinê û rêyek ji bo dîtina hevsengiyek di navbera herikîn û kontrolê de dibîne.



Xwezaya Kurdî jî di karên wî de bi awayekî berbiçav cih digire, ji ber ku ew çiya, newal û deştan bi şêwazek pêşkêş dike. Ew ronahiyê bikar tîne da ku dijwarbûna çiyê ronî bike, siyê bikar tîne da ku dijwarbûna avhewayê tekez bike û şefafiyetê bikar tîne da ku têkiliya zindî ya di navbera mirovahiyê û jîngeha wê de eşkere bike.

### Pêşangehên hunerî û pêşkeftina berdewam a tecrubeyan

Wênesaz Elî Abdullah beşdarî gelek pêşangehên herêmî yên li herêmê bûye û çend berhemên xwe nîşan daye ku bala rexnegir û hezkiriyên hunerê kişandine. Gelekan pesnê şiyana wî ya afirandina kûrahiya dîtbarî bi karanîna teknîkên hêsantir ên li gorî akrîlîk an rûn dane û serkeftina wî di vî warî de wekî nîşaneya gihîştina şêwaza wî û hevgirtina dîtina wî ya hunerî dihesibînin. Wî gelek bawername û spasname bidest xistine, herwiha ew beriya 3 salan hate vexwendin ji bo pêşengeha Hîta a navdeweltî û wî asta sûyemîn bidest xist weke şêwekarekî kurd. Ew beşdarî 30 pêşengehî bûye li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji wan pêşengehan yê wî ên taybet hene.


### Huner wek berpirsiyariyeke çandî

Elî Abdullah hunerê tenê wekî jêhatîbûnek an hobiyek nabîne, lê belê wekî berpirsiyariyek çandî ya ku hunermend li hember civaka xwe hildigire dibîne. Ew bawer dike ku wênesazî xwedî hêz e ku bîranîna mirov û cihan biparêze, nemaze di nav veguherînên bilez ên ku herêm şahidiya wan dike. Ji ber vê yekê nasnameya Kurdî bi awayekî zelal di berhemên wî de heye, çi bi sembolên mîratî, an jî taybetmendiyên rû yên ku çîrokên dirêj ên berxwedanê nîşan didin.

Bi rêya tabloyên xwe yên avî, wênesazê Kurd Elî Abdullah di pêşkêşkirina tecrubeyeke hunerî de serkeftî ye ku hem bi zelalî û hem jî bi kûrahî dagirtî ye. Ew wênesazek e ku hestiyariya ceribandinê bi rastbûna teknîkî û pabendbûna bi mîrateyê re bi vekirîbûna ji bo şêwazên nûjen re tevlihev dike. Bi xwe dispêre rengên avî, wî cîhanek dîtbarî ya bêhempa afirandiye, cîhanek ku bedewiya xwezaya Kurdî bi ruhê mirovên ku lê dijîn re dike yek. Dema ku ew rêwîtiya xwe ya hunerî didomîne, ew îspat dike ku huner dikare bibe cîhek ji bo bîranînê, ji bo bedewiyê û ji bo îfadekirina nasnameya tevahiya gelekî.









## Gotina Dawî



### Pêşeroja Sûriyê!

Mihemed Seydi

Di Kanûna 2024'an de rêjîma Baas hilweşiya û salek di ser vê hilweşînê re derbas bû lê çi guherî? çi di bîra xelkê Sûriyê de ma û çi li bîra wan zêde bû?

Di destpêka ku Rêjîma Baas hilweşiya, gelê Sûriyê kêfxweş bû û hemû daketin qadan lê dema li xwe hayîl bûn yên li şûna wan rûniştin kî ne, tirs ket dilê wan. Lê xwestin bi qaşo vekirina zîndanan xelkê meşxul bikin ku hem wextî wê Îsraîlê hemû baregehên leşkerî û cihên çekên Stratejîk bombebaran kir. desthilata demkî ya nu li Şamê jî di vê navberê re çawa lingê xwe hinekî bi cih kir, li berava Sûriyê li hember Elewiyan komkujî pêk anîn. Di bin navê ku ew alîgirê rêjîma berê ne, ne tenê mirov kuştin, lê terûhişk jî şewitandin. Piştî wê berê xwe dan Siwêdayê û Dûrzî qetil kirin. Di vê navberê de, komên çekdar ên HTŞ'ê gefa qirkirinê li Kurdan jî xwarin û digotin piştî Durzi û Elewiyan dora Kurdan e.

Ji ber agahî hebûn ku di salvegera hilweşîna Rêjîma Baas de ew ê li herêmên bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji aliyê çete û alîgirên HTŞ'ê ve tevlihevî were derxistin, Rêveberiya Xweser kombûnên li cihên giştî qedexe kir. Û ev jî bû sedem ku alîgirên Şamê êrişî Rêveberiya Xweser bikin û li pişt wan de jî dewleta Tirk antîpropagandeya li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Wekî ku ew bi ketina Rêjîmê ne kêfxweşin û Kurdan nexwastiye rêjîm hilweşe. Tevî ku ji her kesî ve diyar e yên herî zêde di nava Sûriyê de ji Rêjîma Baas zerar û zilm dîtî, Kurd bûn.

Li aliyê din, mijareke herî girîng a ku Sûriyê eleqedar dike, mijara Îsraîlê û HTŞ'ê ku niha li Şamê desthilate. Herçiqasî qale danûstandinan di nava aliyan de hat kirin û hin caran dihat gotin ku Ehmed El-Şeria jî tev li peymana Îbrahîmî dibe û dîsa ew ê peymanekê îmzebikin û dest ji dijminatiya li hember Îsraîlê berdin. Heta çend cara hevdîtin him li Fransayê him jî Ezerbîcanê di navbera HTŞ'ê û rayedarên Îsraîlê de çêbûn ku Tirk jî li wir amade bûn. Bi vê yekê dixwastin bibêjin ku HTŞ'ê mêjiyê xwe guhertêye û dixwaze ji bo Demokrasiyê bixebite û dest ji tunderewiya Dînî berdaye. Lê di merasîmên salvegera hilweşandina rêjîmê de li Şamê, endamên qaşo Artêşa Sûriyê, siloganên tunekirina Cuhî û Îsraîlê bang dikirin û digotin ew xwe amade dikin ku ber bi Qudsê ve herin. Ev dîmen li her deverê belav bûn. Li gorî hin agahiyan, Îsraîlê ew dîmen bi taybetî ji Amerîka re şandine ku vaye raste rast gefê li hebûna wan dixun û ew ê baweriyê bi ti awayî bi vê desthilata HTŞ'ê nekin.

Bi vê ve girêdayî, Serokwezîrê Îsraîlê di vê navberê re daxuyaniyek da û nûnerê Amerîka yê li Sûriyê bi vê yekê tohmetbar kir ku ew li gorî erka xwe tevnagere û di her kêliyê de li gorî daxwazên Turkiyê tevdigere. Dîsa di nava van merasîmên qaşo kêfxweşiya bi ketina rêjîma Baas, li Şamê hin serkirdeyên leşkerî yên HTŞ'ê li ser sehnan gef li QSD'ê û Kurdan xwar û got ku ger ew xwe radest nekin, ew ê bi Şûran êriş bikin. Ya mirov dikare ji vê desthilata niha li Şamê fêm bike ew e ku di mêjiyê wê de ji bilî kuştin û qetilkirinê tiştekî din tune û her çiqasî dixwaze xwe medenî bide nîşandan, lê di tevgera wan de radîkalbûn û mêjîyê DAIŞ'ê zêdetir tiştek tune. Lewma, di pêşeroja Sûriyê de tiştekî xêrê naxuyê.

## Sudoku:Pirs 68

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | | | | 8 | | | | 4 |
| 1 | 7 | | | | | 8 | 6 | 2 |
| | | 6 | | | 1 | | | |
| 2 | | 7 | 6 | | | 5 | 4 | |
| | | | | 1 | | | | |
| | 6 | 4 | | | 8 | 1 | | 9 |
| | | | 2 | | | 4 | | |
| 6 | 4 | 3 | | | | | 7 | 1 |
| 7 | | | | 3 | | | | 5 |

## Sudoku: Bersiv 67

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 8 | 1 | 3 | 4 | 5 | 9 | 2 | 6 |
| 2 | 4 | 6 | 8 | 9 | 7 | 3 | 5 | 1 |
| 9 | 5 | 3 | 6 | 1 | 2 | 4 | 8 | 7 |
| 6 | 7 | 9 | 1 | 8 | 4 | 5 | 3 | 2 |
| 3 | 1 | 4 | 5 | 2 | 6 | 8 | 7 | 9 |
| 8 | 2 | 5 | 9 | 7 | 3 | 1 | 6 | 4 |
| 1 | 3 | 2 | 7 | 5 | 9 | 6 | 4 | 8 |
| 5 | 9 | 7 | 4 | 6 | 8 | 2 | 1 | 3 |
| 4 | 6 | 8 | 2 | 3 | 1 | 7 | 9 | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ez dibêjim va hirç, ew dibêje va rêç:**
- Naxwaze rastiyê bibîne; ez rastiyê nîşanî dikim ew xwe bi aliyekî din ve dide.

**Ez sax û nemirî:**
- Ez qebûl nakim; ezê qiyametê rakim.

**Ez nabim benikê dû hebanê:**
- Ez nabim dûvelanikê te; ez li dû te nayêm; ez ne mecbûr im weke te bikim.

Heta nebêje tereq, nabêje heq/sedeq:
- Heta tiştek neyê serê wî, rastiyê qebûl nake; zûbizû rastiyê qebûl nake.

**Heta neçe diyarê gorê, mirin nakeve bîrê:**
- Bi heman wateyê.

**Hirçê heta di xwe de nedît bawer nekir:**
- Heta nehat serê wî, heta pê nehat kirin bawer nekir.

**Kum avetin şer xwestin:**
- Lihevhatin qebûl nekirin.

**Ma min çavên reş û belek ji bo te kil dane:**
- Ji bo çi ezê ji bo te bixebitim; ji bo çi ezê malê xwe bidim te?

**Milemil bi wan ket:**
-Nerazîbûna xwe, rexneyên xwe, aciziya xwe bi dengekî nizim diyar kirin.

**Nayê daqurtandin:**
- Ne ya qebûlkirinê ye.

**Nayê xwarin:**
- Nayê pejirandin; nayê qebûlkirin; nayê borandin; nayê tehemulkirin.

**Serî rakirin:**
- Serî hildan; rabûn serhildanê.

**Serê xwe rakir:**
- Li hember derket; qebûl nekir; nerazîbûna xwe diyar kir; rabû serhildanê.
- Pirsgirêk derxistin.

**Tu bidî zîtika nedî zîtika, tuyê bidî heqê dîzika:**
- Ez tiştên hirewêre qebûl nakim; tu ji destê min xilas nabî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e'



Rêvebera HPC-Jin ya kantona Firatê Zuleyxa Elî diyar kir ku Rêber Apo li ser mijara parastinê wiha dibêje; 'Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e' û got: "Xeterî û gef hîna jî berdewam in, lewra parastin ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê mîna av û nan girîng e."R-7

## Aştî û Civaka Demokratîk bi azadiya jinê re pêkan dibe



Berdevka Patiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Sema Begdaş da zanîn ku Rêber Apo ji bo jinan teoriyên nû pêş xistin, bi banga "Aştî û Civaka Demokratîk" re erk û pêşengtiya jinan piratîkî dike...R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1333 | 14-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## Li kantona Cizîrê serjmariya sewaldariyê berdewam dike

Hevserokê Desteya Sewaldariyê ya kantona Cizîrê Mihemd Tahir Şêxmûs tekez kir ku xebata serjmariya sewalan ku di 27'ê Mijdarê de dest pê kiriye tê domandin û got, "Aramnca me belgekirina hejmara sewalan li tevahî herêmê ye."R-8

# DEMOKRATÎKBÛNA TIRKIYÊ BI ÇARESERIYA PIRSA KURD PÊKAN E

Parlementerê Colemergê Wezîr Parlak diyar kir ku eger dewleta Tirk dixwaze li Tirkiyê pirsa Kurd çareser bike ku hemû gel û baweriyên Tirkiyê hevpar di welat de bijîn, pêwîst e ji bo gelên azadîxwaz zagonekê derxîne û gavan biavêje, wê demê astengiya demorkatîkbûna Tikriyê namîne, ji ber wê hewceye her kes wek Rêber Apo rola xwe ya dîrokî bîne cih da ku çareseriyeke mayînde pêk bê.R-4





## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Hunermenda Kurd Sîmav Efrîn ji xuşîna robaran, xumxuma sulavên Meydankê, ji çîvçîva çivîkan û ji stranên palevanan di demsala çinînê de, xêzên pêşîn ên helbestê vehûnand û bû nasname û dengê Efrîna birîndar.R-9



## Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas, sînornas e

Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas rapora kiryarên li dijî rojnamevanên cîhanî ya salane belav kir, tê de jî kiryarên ku dewleta Tirk li ser rojnamegerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeşîne bi zanebûn paşguh kir. Paşguhkirin tê wateya ku ew rastiyan vedişêre û sînoran di navbera xwe û rojnamevanên azad de ava dike.R-6



## 'Gelek jin li bazara Elwelîd tên firotin'

Jinên Elewî û Durzî diyar kirin ku heya roja îro kiryar û sûcên dijmirovî li ser wan dewam dikin û gotin, "Gelek jinên Durzî û Elewî ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê ve hatine revandin û li bazara bi navê Elwelîd tên firotin." R-3



Dijminatiya li dijî mafên jinan
Bêrîtan Xalid R-2



Rakirina Qeyser Destpêka Pêvajoyek Ceosiyasî Ya Nû Ye
Idrîs Henan R-4

# Aştî û Civaka Demokratîk bi azadiya jinê re pêkan dibe

Berdevka Patiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Sema Begdaş da zanîn ku Rêber Apo ji bo jinan teoriyên nû pêşxistin, bi banga "Aştî û Civaka Demokratîk" re erk û pêşengtiya jinan piratîkî dike. Çawa ku di hemû pêvajoyên şoreşê de têkoşînên jinan serketin, wê di vê pêvajoyê de jî bi ser bikeve.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Di 27'ê Sibatê de Rêber Apo banga"Aştî û Civaka Demokratîk" kir ev pêvajo ji bo tevahî gelê Kurd û di heman demê de ji bo jinan gavek nû bû. Di demekê de ku li tevahî cîhanê şer dijwar hebû, Rêber Apo bi bang xwe ya "Aştî û Civaka Demokratîk" derî li pêşiya şerê cîhanê girt. Ev bang ne tenê ji bo gelê Kurd bû, lê belê ji bo aramî û aştiya tevahî cîhanê bû. Bi vê banga xwe Rêber Apo pêşengtiyê dide helwesta jinan a ji bo aramî û aştiyê. Di pêkanîna vê pêvajoyê de rol û erka jinan ya bingehîne. Di vê çarçoveyê de Berdevka Patiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Sema Begdaş ji Rojnameya me re axivî.

**'Jin bi sentezekî nû beşdarî avabûna civaka demokratîk bû'**

Sema Begdaş diyar kir ku banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ji bo gelê Kurd û jinan pêvajoyek nû bû û wiha got: "Îro li seranserî cîhanê hazirtiyên şer tê kirin di demeke ku li tevahî cîhanê geşedanên şer tên jiyankirin, Rêber Apo bi banga xwe ya Aştiyê û "Civaka Demokratîk" rê li pêşiya tevahî komkujiyan girt. Ev banga Rêber Apo ne tenê ji bo Kurdistan bû, lê belê ji bo tevahî Rojhilata Navîn û cîhanê bû. Herwiha di pêkanîna vê pêvajoyê de erk û misyona jinê girînge. Tevgera ku Rêber Apo piştgirtiya wê dike tavgera jin bû, herdem Rêber Apo ji bo jinan teoriyên nû pêşdixistin. Jinan têkoşînê xwe li hemberî çarçoveyê jiyanê teng kirin, jinan têkoşîn ji bo mafên xwe kirin, lê di vê tevgerê de jin çawa karibe vê çarçoveya teng derbas bike, ji ber îro li seranserî cîhanê doza jin yak doz e. Ji bo vê jî Rêber Apo ev erk û misyon da jin û rojane ev tevger bi tevlîbûna jin, rêxistina jin û îdolojiya rizgariya jin berfireh bû. Herwiha rêxistinkirina jin di milê leşkerî de, pêşxistina zanista Jineolojî bê guman Rêber Apo pêşengtiya van tevgeran jî dike. Gelek Teorî ji bo jinan pêşxistin û niha li seranserî cîhanê li ser van teoriyan nîqaş tên kirin. Ev hemû jî di şoreşa Rojava de piratîkî bû. Di vê şoreşê de jin bi sentezekî nû beşdarî avabûna civakeke demokratîk bû.

Di her pêvajoyekê de jinan mohra xwe li dîrokê dane weke Ş Sekîne Cansiz, Şîlan, Bêrîtan Hêvî, Avesta Xabûr, Arîn Mîrkan û bi hezaran milîtanên mîna van rêhevalan hene ku mohra xwe li dîroka azadî û têkoşîna jinê dane. Herwiha heya roja me ya îro jî ev têkoşîn berdewame. Ji dema raghandina vê pêvajoyê de hemû jin ji nû de armanc, bername, erk û berpirsyariyên xwe avkirin ku vê pêvajoyê biserbixînin û berdewam bikin."

**'Di demokrasiyê de hebûnan jin pîvan û perensîbekî sereke ye'**

Sema Begdaş destnîşan kir ku ev zêdetirî sed salî ye sîstemên netew dewlet hatine avakirin û wiha pê de çû: "Sîstema netew dewletê bandoreke neynî li ser gel û jinan kir. Yên herî zêde dibin qurbaniya van sîsteman jin in. Ev zêdetirî sed salin di sîstema heyî ya netew dewlet de ku ne li gorî taybetmendiya xwezaya Rojhilata Navînin e, ji ber ku Rojhilata Navîn cihê xwedewendan, gelan, netewan û eşîran bûn ku xwe bi awayekî demokrtatîk birêve dibirin. Ev sîstem jî bandora xwe li tevahî Rojhilata navîn kir, îro em di sedsala 21'emîn de ne, Rêber Apo ji bo vê sedsalê dibêje: "Sedsala 21'emîn sedsala azadiya jin û gelan e". Di demokrasiyê de hebûna jin pîvan û perensîbekî sereke ye, eger hebûna jin di cihê biryarê, siyasî û aborî de tune be, em nikarin demokrasiyê pênase bikin. Îro li tevahî Rojhilata navîn pêwîste dewletek demokratîk, Tirkiyeyek demokratîk, Îranek demokratîk û dewleta Iraqê ya demokratîk ava bibin. Îro li Îraqê sîstemek fedral a Kurdan hatiye avakirin, lê ew sîstem heya çi astê demokratîke û hebûna jin heya çi astê tê parastin ji ber ku hemû kesên li ser desthilatdariyê û hikumetê zilamin.

Îro eger mafê hebûna jinê tune be, em nikarin demokrasiyê temsîl bikin. Rêber Apo li ser zemîn, dîroka herêmên Kurdistanê û Rojhilatê Navîn teorîya konfederîzma komara demokratîk, Rêveberiya Xweser û Netewa demokratîk pêşkêş kir."

**'Manîfêstoya "Aştî û Civaka Demokratîk" çareseriya tevahî pirsgirêka ye'**

Sema Begdaş diyar kir ku ji bo pêşxistina vê pêvajoyê divê Rêber Apo baş fêmbikin û wiha domand: "Rêber Apo teorî û têgînên nû li ser esasê zanistê pêşkêş dike, pêwîste felsefeya menîfestoya "Aştî û Civaka Demokratîk" were analîzkirin ji ber ku li ser bingeheke dîrokî, felsefîk û mîtolojî ye. Divê em rastiya wan nasbikin û di piratîkê xwe de bikin. Rêber Apo dibêje: "Hûn çiqas dikarin min fêmbikin, hûn ewqas dikarin pêk bînin". Herwiha pêwîste xwe rêxistinkirin zêde bibe û ev fikir li tevahî cîhanê were belav kirin. Divê em rêxistin û têkoşîna xwe bi rêxistinên jinan re û tevgerên demokratîk re xort bikin.

Rêber Apo di menîfestoya "Aştî û Civaka Demokratîk" de baldikşîne ser (Qatilê Kastîk) ev kesên ku li ser desthilatdariyê hikuma zilim û zordariyê dikin hene, lê li beramberî wê di nava civakê de gel û jin hene eger ev gel xwe birêxistin bikin û têkoşîna xwe xorttir bikin yek dikarin komareke demokratîk ava bikin. Rêber Apo di vê menîfêstoya de rêya çareserî ji me re pêşkêş kiriye, têgîn û têgeh şîrove kirine. Pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin ji bo her gelî çareseriyê tîne, ji gelê Fîlistînê re, ji gelê Efgenistanê re ji gelê Turkiyê re û gelê Sûdenê re çareseriyê tîne."





**'Naskirin di piratîkê de ye'**

Berdevka Patiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Sema Begdaş axaftina xwe wiha bi dawî kir: " menîfestoya "Aştî û Civaka Demokratîk" li her derê tê xwendin, di hemû saziyan de tê xwendin û em jî weke PYD'ê me xwend û perwerde jî li ser hatin çêkirin. Li demê pêş de weke plansazî li pêşiya me heye ku emê dîsa menîfestoya "Aştî û Civaka Demokratîk" bixwînin li beramberî wê kêmaniyên me çi ne û çawa emê derbas bikin. Em naskirina xwe ji menîfestoyêre di piratîka xwe de hewaldidin pêkbînin."



## Ji Ramanên Jin



### Dijminatiya li dijî mafên jinan

**Bêrîtan Xalid**

8'ê Kanûna 2024'an, ji derbeyek leşkerî ku ji aliyê yek alî yê şerê Sûriyeyê ve li dijî aliyê din hat kirin, wêdetir nebû. Ev geşedan, bêguman bû sedema veguhestina desthilatdariyê ya nedemokratîk û dûrî aştiyane.

Ev rewş, bi taybetî di aliyê civaka sivîl û tevgerên jinan de veguherî gefek cidî. HTŞ dijminahiyek zêde li dijî mafên jinan dike.

Ev yek di komkujiyên ji aliyê rêxistinên mîna El Qaîde, El Nusra û DAIŞ'ê ve li dijî jinan tên kirin, bi awayekî zelal tê dîtin.

Pergala ku HTŞ dixwaze ava bike, bi tecrubeya "Hikûmeta Rizgariyê" ya ku ji sala 2017'an vir ve li Îdlibê tê damezrandin, derket holê. Îro, ev pêkanîn heta Şam, Hama, Humus û herêmên peravê yên Sûriyeyê belav bûye.

Di heyama kontrola HTŞ'ê ya deverên gundewarî yên Îdlib û rojavayê Helebê de, êrîşên li dijî jinan bi awayekî diyarker zêde bûn. Revandin, tecawiz, girtinên kêfî, ferzkirina hicaba mecbûrî û sînorkirin û qedexeyên tund di qada perwerde û kar de pir zêde belav bûn.

Ji bilî vê yekê, li bazarên ku li Îdlibê ava kir re, pratîkên ku serdema navîn tînin bîra mirov jinan kirin amûr. Li gorî raporan, HTŞ'ê hicabê ji bo jinan ferz kiriye û ji bo rêwîtiyê refaqetên mêr ferz kiriye . Piştî dagirkirina Şamê ji aliyê HTŞ'ê ve ev pêkanîn ji raya giştî re bêtir xuya bûn. Daneyên qadê jî nîşan didin ku hejmara jinên Elewî yên hatine revandin zêdetir e. Bi hezaran jinên Êzidî û Durzî jî bi heman rengî hatine hedefgirtin.

Bi milyonan jinên Sûriyeyî, di bin şert û mercên dijwar ên aborî û civakî de têkoşîna jiyanê didomînin.

Sînorkirin û qedexeyên li ser azadiya tevger, perwerde û kar, di nava binpêkirin û sînorkirinên herî girîng ên ku hatine belgekirin de ne.

Di sala derbasbûyî de li Sûriyeyê, binpêkirinên mafên mirovan zêde bûn.

Bi zêdebûna şîdet û kaosê re, gelek awayên binpêkirinê hatin tesbîtkirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê modelek cuda derketiye holê. Rêveberiya Xweser, di saziyên sivîl û siyasî de di navbera jin û mêran de pergala hevserokatiyê pejirand. Ev yek di dîroka tevgera jinên Sûriyeyê de mîna gaveke girîng hat dîtin û bû yek ji destkeftiyên herî girîng ên salên dawî.

Vê pêşketinê, jinan di rolên pêşengiyê de bihêz kir û rêgeza wekheviyê ya di pêvajoyên biryardayînê de xurt kir. Li Suweydayê rewş cuda bû.

Jin, ji bo ku hêrs û êşa xwe li dijî zilm û zexta demdirêj a di bin rejîma berê nîşan bidin, derketin kolanan . Berevajî vê yekê, jinên Suweydayê vê modelê bi tundî red kirin û li dijî sînordarkirinên heyî derketin.

Qeyrana aborî ya kûr, jin neçar kir ku ji bo mîsogerkirina pêdiviyên malbatên xwe, bikevin nava bazara hêza kar. Sala borî, tecrubeya jinan a li Sûriyeyê, hem destkeftî û hem jî paşketinan di nava hev de nîşan da. Ger pergala heyî ku xwe di asta demokratîk û mafên jinan de pênase dike guherîn û veguhertinek nejî, Em nikarin behsa Sûriyeya demokratîk û mafên jinan bikin. Lewma, ji bo di pêşeroja Sûriyeyê de avakirina pergaleke jinan a adil û domdar divê qanûn ji referansên mezhebî û olî werin veqetandin.



# Şerê Rûsya û Ukraniya; herî zêde sivîl dibin qurban

Ji sala 2022'an ve û heta niha şerê di navbera Rûsya û Ukraniyayê de bênavber dewam dike, bandora vî şerî li ser asta tevahî cîhanê hebû. Li gorî raporên navneteweyî ji destpêka şer ve zêdeyî 500 hezar kes ji herdû aliyan hatine kuştin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Şerê Rûsiya û Ukrayinya**

Ji sala 2022'an ve şerê di navbera Rûsya û Ukraniyayê de berdewam dike, herwiha şerê bi telîmata Serokê Dewleta Rûsyayê Vladimir Putîn va dest pê kir bi taybetî li herêma Donetskê bi tundî didome. Di heman demê de, Krîza şerê Rûsya û Ukrayna bandor li ser aboriya hemû welatan bi taybet Ewropayê kiriye. Rûsya, Ukranya di çarçoveya serweriya xwe ya xwezayî de dibîne. Piraniya wê bi sedsalan beşek ji Împaratoriya Rûsyayê bû û beşekî mezin ji Ukraniyan bi zimanê Rûsî diaxivin. Herwiha welat beşek ji Yekîtiya Sovyetê bû heya ku di 1991'an de serxwebûna xwe bi dest xist. Li Ukranya yê jî nifûseke mezin a Rûsan heye. Li gorî serjimêriya ku di sala 2001'ê de hatiye kirin, nêzî 8 milyon Rûs li Ukranyayê dijîn û bi piranî li başûr û rojhilat dijîn. Ji bilî hesta Rûsyayê ya ji bo Kiyv, rastiyek nifûs jî heye ku ji bo Mosko pir girîng e. Piştî Şoreşa 1917'an û şerê cîhanê yê duyemîn, Rûsyayê Nîvgirava Balqanê, ji bilî Yewnanîstanê, bi rêya hevpeymanya Varşovayê bi dest xist. Bi vê yekê, di dema Şerê Sar de Derya Reş veguhirî herêmek bi piranî Sovyetê, lê beşa başûrê Deryaya Reş li dervayî serweriya wê ma ku ew beş jî di nava Tirkiyê de, endamê NATO`yê ye.

Ji aliyê stratejîk ve, gihîştina Deryaya Spî ji bo hêzên Sovyetê zehmet bû, lê ji bo yekîneyên NATO`yê zehmet bû ku derbasî Deryaya Reş jî bibin û tê de bixebitin. Di encamê de, hevsengiya hêzên deryayî ku xizmeta herdu aliyan dike, derket holê. Di Kanûna 2021'an de, zêdetirî sed hezar leşkerên Rûs li nêzî sînorê Rûsya û Ukranya bi cih bûn. Di heman demê de, rayedarên istîxbarata Amerîkayê hişyarî dan ku dibe Rûsya di destpêka sala 2022'an de dest bi êrişên dagirkeriyê bike.

**Şerê Rûsya û Ukrayna di dîrokê ya têkiliyên navneteweyî ye**

Şerê Rûsya û Ukrayna di dîrokê ya têkiliyên navneteweyî yên nuhîn de xeyaleke girîng e. Ev ne tenê têkiliyek di navbera du dewletan de ye, lê jî testeke li ser karînîya hêzên cîhanî û herêmî ye da ku balansên stratejîk biparêzin û pêvajoyên siyasî, aborî û civakî li Ewropa û cîhanê biguherînin. Rêkûpêkên vê têkiliyê dirêj in û di demek piştî şikandina Yekîtiya Sovyêtî de derdikevin, dema ku Ukrayna dest bi ava kirina dewletek modern kir ku bi normên demokratîk re girêdayî bû û hewl da ku bi Yekîtiya Ewropayê û NATO re têkiliyên nêzîkî ava bike. Rûsya lê, vê pêvajoya wekî biryarî rastî ji bo xwe yên stratejîk tê hesibandin û di vê wateyê de berfirehkirina NATO'yê rojava wekî tahdîd ji bo ewlehiya neteweyî û siyasî ya xwe tê dîtin. Ev tensîyonên dîrokî, civakî û siyasî dawî bûn ku şer di qada mezin de bidest xistin, dema ku hêzên Rûsya herêmên Ukraynayê dagirin da ku armancên stratejîkên pirçandî bigirin, di nav de kontrola herêmên sinorî, preskerdina rêkûpêkên serokatiya Ukrayna û xwestina rêxistina realîtya geopolitîk ya nû di herêmê de bûn. Şer dimenên leşkerî yên pir kompleksî yên xwe girt. Rûsya stratejiyên hêsan û parastinê yên pêşkeftî bikar anîn, tê de hêza hewa, operasyona taktîkî û pêşveçûna zû ya erdî li herêmên taybetî hatin. Ukrayna jî li dijî wan stratejiyeke parastinê ya berhemhatî bi hewandina çarçoveyên avanser a xwe yên Rojavayî û piştgirîya lojîstîkî ya domdar kar kir. Ferqên li dijî leşkerî hatine xuyang kirin û xeta frontekan gûherî, ku şer bû şerê dirêj a têkişînê, bi encamên xwînperest û xebatên bingeha civakî. Vê rewşê de şer ne tenê şer li ser erdê bû, lê jî şer li ser nasnameya neteweyî, xelasiyên siyasî û civakî bû.

**Ziyanên Aborî**

Li ser aborî, şer bandoreke mezin li Rûsya, Ukrayna û Ewropa kir. Rûsya di encamê de xercên mezin ji ber sanksiyona navneteweyî têk çûn, tê de sinorên li ser sermayê, qada teknolojiya pêşkeftî û astengên malî hatine girtin. Ev çalakî, bi zêdebûna xercên leşkerî re, nirxa dravê ji ber xwar û pergalên hilberîna endüstriyel dijwar bûn, ku Rûsya bi stratejiyên xwe bo adaptação û stabîlkerdina aborî hat destnîşan kirin. Ukrayna jî ji hêla şerê ve qezaya aborî ya girîng xistin; bingeha civakî têk çû, bazirganiya domdar girtin û hilberîna endüstrî û cotkarî rawestî. Ev tesîrên aborî qada kar û beşên endüstriyê destabilîze kirin, bêkarî û fukarî zêde kirin û hewceyeke zû ji bo piştgirîya navneteweyî û xebatên vegerandina bingeha aborî hatin.

**Şer bandoreke mezin li gelan kir**

Li dor civakî û mirovahî şerê Rûsya û Ukraniya bandoreke mezin li ser gelan kir, wek xwepêşandin, rawestina karûbarên bingehîn û zêdebûna fukarî. Ev krîza mirovahî hewceyeke piştgirîya navneteweyî ye, da ku alîkariya gîhandin û planên dirêj a vegerandina civaka sivîl li herêmên têkildar û başkirina xweşbînî û civakî ya gelan ku ji têkoşîna rastî û ne rastî şerê hatine xetandin pêk bîne.



**Bi hezaran kes koçber bûn**

Di navbera salên 2022–2023'yan de, bi hezaran kes ji herêmê koçber bûn û li herêmên cude ên Ukranya bar kirin. Di bin pêşandana UNHCR de, hat eşkerekirin ku heta 2024'an ji 6–7 milîon mirov wekî pênaberan li Ewropa û herêmên din cih digirin. Ewqas ji koçberan dike ku hijmara niştecihan kêm bibe, bi vê yekê kontrola xwe li ser jiyana mirovan tînin ku bibin kole, ev rewş bi giştî bandora xwe li ser aborî jî pir mezin heye. Bi awayekî giştî, şerê Rûsya û Ukranya di 21'ê sedsalê de koçberiyeke mezin da çêkirin. Hêrs û qetandina jiyanên mirovan, bi taybetî penaberî û koçberî, ne tenê rewşa civakî, lê demografîk û aborî diyar dikin.

**Bandora şerê Rûsiya û Ukraniya li ser mirovan**

Şerê Rûsya û Ukrayîna ku ji salê 2022'yan ve dest pê kir, ne tenê li herêmê, lê belkî li ser astê cîhanê jî bandora girîng çêkir. Ev şer bandora xwe di nav çar çarçoveyan de nîşan da; çanda mirovî, rewşa civakî, aborî û demografîk. Bi bombebaran û şerê berhevkirî, gelek bajar û gundên li Ukranya hatin hewleşandin. Herwiha bi miloynan mirov ji tirsa jiyaneke bêewle û pêşerojeke winda, deroniya wan xerabûye û hatine windakirin. Ev rewş jî ji bo zarokan û jinan pir giran e. yên di bin qurbanî ji şer û pevçûnan, gel e ku jiyan û pêşeroja wan ber bi tarîtiyê ve diçe û gelek ji wan dibin qurbanî.

Li gorî rojnameya Amerîkî The New York Times ku artêşa Rûsyayê li hemû eniyên şer ên Ukraynayê pêşve diçe, di demekê de ku Serokê Rûsyayê Vladimir Putin ji daxwazên xwe yên ji bo çareserkirina nakokiyan paşve gav navêje.

Li gorî rayedarên Ukraynî, Rûsyayê ji şeva 5'ê berfenbarê zêdetirî 650 dron û 51 mûşekan êrîşeke berfireh li bajar û bajarokên Ukraynayê dane destpêkirin.

Li gorî rayedarên Ukraynî, Rûsyayê ji 5 'ê Berfanbarê ve zêdetirî 650 dron û 51 mûşekan êrîşeke berfireh li bajar û bajarokên Ukraynayê da destpêkirin.

# NY: Ji bo pêdiviyên mirovî li Yemenê 2.5 milyar dolar tê xwestin

**Navenda Nûçeyan**

**Neteweyên Yekbûyî hişyariya zêdebûna pêdiviyên mirovî ji bo Yemenê sala bê; da û tekez kir ku eger fînansmana bilez neyê peydakirin wê welat ber bi aloziyên mirovî yên herî xirab ên cîhanê ve biçe.**

Ev hişyarî di çarçoveya bangewaziyek fînansekirinê ya nû de hat ku tê de NY tekez kir ku plana bersivdayînê ya sala bê dê tenê 10.5 mîlyon kesan hedef bigire, mudaxeleya rewşê dê bi cidî li ser aliyên herî lezgîn, wekî pêşîgirtina li birçîbûnê, dermankirina xurekê, kontrolkirina belavbûna nexweşiyan, bi taybetî li deverên dûr û kêmbûna xizmetê; bisekine.

Agahiyên herî dawî yên NY nîşan didin ku 23.1 mîlyon Yemenî dê hewceyê alîkariyê bin, di heman demê de rêxistina navneteweyî ragihand ku ji bo fînansekirina pêdivî bi 2.5 mîlyar dolarî heye

Lê belê pilanê zelaliyeke pêşkêş nekir li ser çawaniya pêkanîna çalakiyan li herêmên di bin serweriya Hûsiyan de, piştî ku vê komê di Îlûna borî de nivîsgehên NY û rêxistinên navneteweyî girtin û bi dehan karmendên wan girtin di nav de 59 karmendên netewî.

Daneyên ji plana bersivê eşkere kirin ku 18.1 milyon kes bi bêewlehiya xwarinê re rû bi rû ne, di nav de 5.8 mîlyon kes di asta birçîbûnê ya awarte de dijîn û 40,000 kes di xetereya birçîbûnê ya bilez de ne.

2.5 milyon zarokên di bin pênc salî de û 1.3 milyon jinên ducanî û şîrdêr ji kêmbûna xwarinê êşê dikişînin, di nava kêmbûnek mezin a bernameyên xwarin di mehên dawî de.

**Xizmetên bingehîn hilweşiyan e**

Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku xizmetên girîng, wekî lênihêrîna tenduristiyê, av û paqijî rastî hilweşînek mezin hatine. 8.41 mîlyon kes ji bo gihîştina lênihêrîna tenduristiyê ya bingehîn zehmetiyê dikişînin, 15 mîlyon di bêewlehiya avê de dijîn û 17.4 mîlyon kes ji gihîştina xizmetên paqijiyê bêpar in. Herwiha 6.2 milyon kes piranî jin in ku hewceyê xizmetên parastinê ji tundûtûjiya li ser bingeha zayendî ne. Di heman demê de 2.6 milyon zarok ji ber koçberî, xizanî û xirabûna berdewam a binesaziya perwerdehiyê ji dibistanê bêpar mane.



**Sînorkirinên Hûsiyan**

Ji Tebaxa borî ve, qedexeyên ku ji hêla Hûsiyan ve li ser xebatên NY û rêxistinên din ên alîkariyê li deverên di bin kontrola wan de hatine ferzkirin, zêde bûne. Kiryarên wan gihaşt girtina nivîsgehên netewî, ev yek bû sedema rawestandina bernameyên bingehîn, weke Bernameya Xwarinê ya Cîhanê, ku alîkarî da nêzîkî 13 milyon Yemeniyan.

# Hebûna jin di nava şer de û welatên ku leşkertiya jin bi mecbûrî û dilxwazî dipejrînin

**Esma Mistefa**

Me xwest di vê rapora xwe de em balê bikşînin ser welatên ku di serdema heyî de leşkertiya jin ya bi neçarî û bi dilxwazî dikin û yek û yek şîrove bikn her wiha di dema niha de weke leşkeritiya jin tê pênasekirin, lê demên berê de bi hezaran jin hebûn ku pêşengtiya şeran û têkoşînan dikirin û dibûn hêza sereke ya serkeftinê. Pergala heyî pêşengtiya jin ji hemû qadên jiyanê re ji xwe re bikar anîne û li gor xwe formûlîzekirine. Bîrdoziya beşdarbûna jin bi tayebt di nava şer de û rola pêşengtiyê wergirtin, ji cewherê wê derxistine û niha di bin nav û kadegoriyeke pir ji rêzê weke leşkertiya jin pênase kirine. Bi zihniyeta zayendperest, dewletperest û îdeolojîperest pergaleke li gor berjewendiyê hêzên hegemon dimeşînin. Li aliyê din di serdemek ku jin di bin navê leşkertiyê de tê pênasekirin û perwerdekirin. Di rasthatina dîrokê de, hêza ku jin bi cewher, exlaq, zanebûn, xwedîderketina li nirxên jina pîroz û vejînkirina hêza pêşengtiya jin, derket holê. Ew jî Yekîneyên Parastina Jin YPJ ne.

Di cîhanê de ji serdemên kevin de jin tevlî şer û cengan dibin, pirî caran ew jin dibûn xala serkeftinê yên wê şerî. Hebûna jin nava artêşan da, her çiqas li gor serdeman ne fermiyetek bû, lê jinên pêşeng ku weke pêşeng û fermandarên birêvebirina şer bûn, hebûn. Ji wan jinên ku di qada şer de cih girtine Radiya Sultana (Hindistan) Wê di şeran de rêberiya hêzên xwe kir (1236-1239 serwerî kiriye). Qutulun (ji eşîra Magol) Weke şervaneke jêhatî tê wesifandin, ew di kampanyayên leşkerî de bi bavê xwe re bû. Hangajo Gozen (Japon) Wê bi jêhatîbûna xwe ya tîrbaziyê kelehek parast heta ku di sala 1201'an de bi tîrekê hat kuştin. Şahyar Zenobiyar (Tedmor, Sûriye): Wê di sedsala sêyemîn a piştî zayînê de li Sûriyeyê li dijî Împeratoriya Romayê artêşa padîşahiya Palmyrene (Tedmor) bi rê ve bir. Ew jineke pir wêrek û xwedî kultur û zanîn bû. Her wiha Şahyar Kleopatra (Misir): Wê ji bo parastina serxwebûna Misirê, li dijî Romayiyan şerên siyasî û leşkerî yên mezin kir. Di serdema nû ne dur de Şehîd Bêrîtan (Gulnaz Karataş Têkoşera Kurd): Jina Kurd ya ji bajarê Dêrsimê yê Bakurê Kurdistanê ku di Tevgera Azadiya Kurdistan de têkoşera bû. Bi çalakiya xwe ya fedayî ya ku teslîmiyetê qebûl nake li hember hêzên PDK'ê dibe îlhama avabûna Artêşa Jinên Kurd di Tevegera Azadiya Kurdstan de. Ev weke mînak in lê bi sedan jin hene ku di nava şer û cengan de pêşengtî kirine. Li kêlek şerê ku dikirin, hebûna jin di aliyê piştgirî û alîkariya artêşê de pir li pêş bû. Nemaze; Jinan li meydanên şer wek hemşîreyan kar dikirin, jinan di amadekirina xwarinê ji bo şervanan de alîkarî kirin her wiha destekdayîna locistîkî dikirin. Bi van alîkarî û piştgiriyan jin dibûn hêza hundirîn a serxistina şer. Jin di aliyê watedayîn, avakirina dengeyan ku çawa bi civakê re eleqedar bibe da ku gel li ser piyan bimîne, xwedî cihekî pir balkêş bû. Em van gotinan ji ber xwe ve nabêjin, bi sedan û hezaran jinên ku di dîrokê de hatine dîtin û navê wan heyanî niha di bîrwariya dîrokê ya cîhanê de hatine kolandin hene.

### Yekîneyên Parastina Jin YPJ

Di serdema nû de artêşa jin a yekem ku ne bi zorê û ne jî bi dixwazî hatiye avakirin. Bi rihê welatparêziyê, hêz û îradeya jinên ku pêşengtiya serdeman kirine û nîvçoyî hêştine hatiye avakirin; Yekîneyên Parastina Jin YPJ. Yekemîn hêz û artêşa serbixwe ya jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û nasnameya navneteweryê wergirtiye. YPJ'ê li dijî leşkertiya jinane, ew bi xwe hêz û artêşeke ku bi hezaran ji jinan pêk tê.

Yekîneyên Parastina Jin, hêzeke leşkerî ye ku felsefea Rêber Abdullah Ocalan ji xwe re bingeh digre. YPJ'ê ji hemû jinên pêkhateyên li Sûriyeyê pêk tê. YPJ'ê di sala 2013'an de ji bo parastina sivîlan, bi taybetî jinan, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û ji bo parastina prensîbên Rêveberiya Xweser hat damezrandin. Ev yekîne beşek ji Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) ne û bi Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ve girêdayî ne. YPJ'ê ji ber rola xwe ya bi bandor di şerê li dijî Dewleta Îslamî (DAIŞ) de nasnameyeke navneteweyî bi dest xistiye. YPJ ji ber hêz û taybetmendiya xwe di temsîlkirina hêza jin a di qada leşkerî de ku di cîhanê de yekemîn artêşa jin hatiye avakirin, dengvedaneke navnetewî û cîhanî avakir. YPJ'ê hêzeke cihwaz e çima? Ji ber ne tenê stratejiya şer ji xwe re esas digre, di heman demê de hêzeke îdeolojîke ku dikare xwe di hemû aliyên civakê xwe birêxistin bike ye. Perwerdeyên bîrdozî, paradîgmeya Rêber Abdullah Ocalan, têkoşîna li hembr zihniyeta mêrperest û bi taybet parastina mafê jinan, ji xwe re esas digre.



### Yekem: Welatên ku jinan neçarî leşkeriyê dikin (xizmeta leşkerî ya mecbûrî)

1. Îsrayîl - Ji sala 1948'an vir ve jin tên mecbûrkirin ku xizmeta leşkerî bikin û ji temenê nêzîkî 18 saliya xwe ve xizmeta leşkerî pêk tînin. Di rola jinan a di nav Hêzên Parastina Îsraîlê (IDF) de guherînek berbiçav heye, rêjeya jinan di hêzên leşkerî de gihîştiye astek bêhempa ku guhertinek stratejîk û civakî di saziya leşkerî de nîşan dide. Li gorî daneyên fermî, rêjeya jinên di hêzên leşkerî ên artêşa Îsraîlê de %20.9 e ku ev jî rêjeyeke pir bilinde. Di çerxa wergirtina leşkeran a herî dawî de (Pola 2024), zêdetirî 5,000 jin di rolên şer de hatin tomar kirin. Ji jinên ku xwedî kapasîteya bijîşkî û derûnî ne ji bo xizmeta şer. Ji wan nêzîkî çaryekê jî hildibijêrin ku tevlî rolên şer bibin.

Li Îsraîlê beşdarbûna jinan di şer de ne tenê nîşana hêza xwer a leşkerî ye, lê di heman demê de beşek ji pêla guherîna civakî ye jî gelek jin xizmeta leşkerî wekî rêyek ji bo hêzdarkirin û beşdariyek bi bandor di parastina neteweyî de dibînin.

2. Nerwêc - Yekem welatê Ewropî ye ku xizmeta leşkerî ya mecbûrî ji bo jinan ji sala 2016'an vir ve de ferz dike. Di Cotmeha 2014'an de, parlementoya Nerwêcê qanûnek derxist ku rê dide jinan ku werin leşkeriyê, û di bin hin mercan de xizmeta leşkerî ji bo hem mêr û hem jî jinan mecbûrî dike. Her wiha li gorî ku hatiye danîn xizmet 12 mehan dom dike. Nerwêc bi vê zagonê ku jin û mêr di leşkertiyê de weke hevin, ev gavek e ku di asta NATO û Ewropayê de wekî dîrokî tê hesibandin. Li gorî qanûnê ji temenê 19 dalî dest pê dike heyanî 44 salî. Her çend xizmeta leşkerî ji hêla qanûnî ve mecbûrî be jî, Nerwêc hemû kesên divên bên leşkertiyê nagire. Leşkerên nû li gorî muayeneyên bijîşkî û psîkolojîk her wiha asta xwestinê têne hilbijartin. Hejmara leşkerên ku di salê de tên şandin ji nêzîkî 60,000 kesên mafdar bi qasî 8,000-10,000 tên girtin.

3. Siwêd - Di sala 2018'an de xizmeta leşkerî ya mecbûrî ji bo hem mêr û hem jî jinan ji nû ve dest pê kir. Di gavekê de ku armanca wê xurtkirina şiyanên parastina neteweyî bû, Siwêdê di sala 2018'an de xizmeta leşkerî ya mecbûrî ji bo hem mêr û hem jî jinan vegerand, piştî ku xizmet berê bi dilxwazî bû an jî tenê ji bo mêran bû. Kesên ku dixwazin werin erkdarkirin, hemwelatiyên Siwêdê û niştecihên daîmî yên 18 salî û mezintir dihewîne.

4. Koriya Bakur - Jin ji temenê 18 heta nêzîkî 23 salî di xizmeta leşkeriya mecbûrî de ne. Di sala 2015'an de, rayedarên Koriya Bakur biryar dan ku xizmeta leşkerî ji bo jinên 17 heta 20 salî piştî ku ji dibistana navîn an lîseyê xilas dikin, mecbûrî bikin. Hêjayî gotinê ye ku beriya derketina vê biryarê leşkertiya jin bi dilxwazî bû. Jin nêzîkî ji %20 ji artêşa Koriya Bakur pêk tînin.

Ji ezmûnên jinên ku hatine wergirtin û mafên mirovan rapor hene ku nîşan didin ku hin jin di nav artêşê de di şert û mercên dijwar de jiyan dikin, di nav de paqijiya nebaş, kêmbûna pêdiviyên jinan, û heta bûyerên destdirêjiya cinsî ji hêla efseran ve tên kirin.

Hin çavkanî dibêjin ku leşkerên jin neçar in ku ji bilî perwerdehiya leşkerî karên navmalî (çêkirina xwarinê, paqijkirin) bikin.

5. Erîtiriya li parzemîna Efrîqiya yê - Jin û mêr mecbûrî xizmeta leşkerî ne. Qanûn destnîşan dike ku welatiyên di navbera 18 û 50 salî de (mêr û jin) mecbûr in xizmeta leşkerî bikin. Dema xizmeta fermî ji 18 meh e pêk tê 6 meh perwerdehiya leşkerî û 12 meh karê "pêşveçûna neteweyî" an erkên sivîl di nav dewletê de. Gelek jinên ku hatine wergirtin ragihandine ku rastî îstîsmara cinsî hatine, di nav de tacîz û tecawiz ji aliyê efseran ve. Hin rapor hene ku redkirina hin zextan dibe sedema cezayan weke şandina jinan ji cihên xebatê yên herî zehmet. Her wiha li gorî rêxistinên hiqûqî tu alî nîna ku parastina wan jinan ji kiryaran bike, nîne.

Hin rapor destnîşan dikin ku jinên ku di dema xizmetê de ducanî dibin, dibe ku werin berdan an jî dermankirina taybetî bistînin, lê her gav piştgirî ji bo dayikan piştî zayînê tune ye. Di hin belgeyên kevintir de behsa îstîsnayek nefermî an jî îstîsnayek ji xizmetê ji bo hin jinên zewicî an dayikan tê kirin, lê ev her gav bi domdarî nayê sepandin. Her wiha rûxmî ku dema xizmetê 18 meh in, lê pirî caran vê wextê dirêjtir dikin û ev yek rasî gelek rexneyan ji aliyê rêxistinên mafê mirovan ve hatiye.

6. Venizwêla - Jin li gorî Qanûna Parastina Neteweyî mecbûrî leşkeriya qismî ne. Di sala 2009'an de, parlementoya Venizwêla qanûnek li ser leşkeriya neçarî û seferberiya leşkerî derxist, ku her du zayendan digire nav xwe û temenê xizmeta mecbûrî ji bo ciwan û kesên mezin heyanî 60 salî destnîşan dike. Qanûn "erka pêkanîna xizmeta leşkerî an sivîl" vê yekê destnîşan dike, lê destûra bingehîn a Venizwêla destûrê dide nebicîhanîna leşkeriya neçarî ku bi vê yekê re nezelaliyek qanûnî derdikeve. Tevî qanûnê jî, leşkeriya jinan bi qasî leşkeriya mecbûrî ya daîmî bi tundî natê cîbicîkirin. Gelek rapor dibêjin ku di rastiyê de, leşkeriya neçarî bi giranî li ser xwebexşiyê disekine, ne li ser seferberiya girseyî an gazîkirina mecbûrî ya di asta mezin de.

### Duyem: Welatên ku bi dilxwazî jin tevlî leşkeriyê dikin

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê US - Jin di hemû şaxên artêşê de xizmet dikin, tevî yekîneyên şer.

Fransa - Jin rêjeyek mezin ji hêzên çekdar ên Fransayê pêk tînin.

Almanya - Ji sala 2001'an vir ve jin dikarin tevlî hemû qadên leşkerî bibin.

Keyaniya Yekbûyî (Memlekê Elmutehîde) - Artêş ji sala 2018'an vir ve bi tevahî ji bo jinan vekirî ye.

5. Rûsya - Jin bi dilxwazî di gelek rolan de di artêşa Rûsyayê de xizmetê dikin.

6. Çîn - Xizmet bi dilxwazî ye, û bi hezaran jin di artêşa Çînê de hene.

7. Kanada - Jin di hemû warên xizmeta leşkerî de bi mêran re wekhev in.

8. Tirkiye – Ji bo jinan leşkeriya mecbûrî tune ye, lê ew dikarin bi dilxwazî tevlî artêşê bibin.

9. Hindistan - Jin her ku diçe bi dilxwazî di hêzên çekdar de xizmetê dikin.

10. Brezîlya - Xizmet ji bo jinan li gor wan e, bi taybetî di warên bijîşkî û îdarî de.

Sêyem: Welatên Erebî yên ku jinan (bi dilxwazî an bi awayekî sînorkirî) leşkertiyê dikin

1. Mîrnişînên (Îmarat) Erebî yên Yekbûyî - bernameyên ji bo wergirtina jinan dan destpêkirin (di destpêkê de bi dilxwazî, paşê ji bo hin kategoriyan qismî mecbûrî ye).

2. Urdun - Di warên îdarî, bijîşkî û leşkerî de wergirtina jinan bi sînor e.

3. Tunis - Yek ji welatên Erebî yên pêşîn ku destûr da jinan ku di artêşê de xizmet bikin.

4. Cezayîr - Jin bi dehan salan e di artêşê de xizmet dikin, bi hejmareke girîng.

5. Misir - Xizmeta leşkerî ya mecbûrî tune ye, lê hin jin bi dilxwazî di warên bijîşkî an teknîkî de di artêşê de xizmet dikin.



# 'Gelek jin li bazara Elwelîd tên firotin'

Jinên Elewî û Durzî diyar kirin ku heya roja îro kiryar û sûcên dijmirovî li ser wan dewam dikin û gotin, "Gelek jinên Durzî û Elewî ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê ve hatine revandin û li bazara bi navê Elwelîd tên firotin."

**Biruc Resûl/Qamişlo**

Bi navê şerê bi bermahiyên rejîmê re, zêdetirî 30 hezar kes ji pêkhateya Elewî bûn qurbanî li ser destê hikumeta veguhêz a Şamê. Di milekî de komkujiyan dike û di milekî de jî hêsiran li ser qurbaniyan dibarîne, wekî ku ji derveyî siyaseta wî tevger hatiye meşandin. Ji bo rêgirtina li ber komkujî û şerekî navxweyî, QSD'ê peymanek bi Ehmed El Şeri re danî û heta roja îro jî cidiyeta Şamê di nava gumanan de ye. Di dema dawîn de, komên ku qaşo nayên kontrolkirin, êrişên xwe vê carê li ser pêkhateya Durzî pêk anîne, li Ceremana, Eşrefiye û gundewarên Siweydayê ku zêdetirî 100 sivîl û berevanên Durzî canê xwe ji dest dane.



Rîm El-xecirî



Fatin Xedûr

### Malbat ji kokê ve hatin kuştin

Bi taybetî piştî rejîma Baas'ê çû û li şûna wê HTŞ`ê hat ser hikûmetê û bi demkî dimeşîne, êrişên bi vî rengî dem bi dem dewam dikin. Roj bi roj ev êriş zêde dibin. Beriya van êrişan li bajarên Lazkyê û Beravê êrişên li ser elewiyan hebûn. Bi dehan komkujî pêk hatin. Malbat ji kokê ve hatin kuştin. Ciwan li pêş çavê dayikan kuştin. Kiryarên hovane li ser civakan kirin.

### Êrişên dawîn li Sûriyê û fitneyên mezhebî

Durziyên li Siwêdayê ku bi helwesta xwe ya dijberî rejîma Beşar Esed dihatin naskirin, piştî hilweşîna rejîmê, rastî gelek êriş û fitneyên mezhebî yên tune hatin. Di vê dawiyê de jî ew fitne li Sehnaya û Cereman teqiyan û gihaştin gundewarê Siwêdayê. Ev êriş, di 28'ê Nîsanê de, bi belavbûna dengekî qeydkirî ku neheqiyê li olê dike zêde bûn. Durzî û xwendekarên li zanînehan rastî êrişên çekdarên desthilata Şamê hatin, bi wê re gelek ji wan hatin qetilkirin û birîndarkirin. Êdî bi Heyeta Tehrîr El Şam ku îdia dike hikumetê, bawer nakin. Em banga destwerdana navneteweyî dikin ku sivîlan biparêzin û sûcên yekser rawestînin. Di heman demê de komkujiyên ku di 13'ê Tîrmehê de ji hêla terorîst û desthilatdariya tekfîrî ve hatine kirin, bi hinceta şikandina pevçûnên di navbera xelkê Suweyda û eşirên Bedewî de ketine Suweydayê, nayên veşartin. Gelê Sûriyê bi hezaran salan e bi bedewiyan re dijîn û qet rastî şerekî mezhebî yê ewqas hovane nehatine. Êrişî sivîlên bêguneh hatin kirin, mal hatin şewitandin, milk hatin talankirin û bi hezaran sivîl ji gundên rojava ber bi deverên ewletir ve hatin koçberkirin. Heta jin jî bi tecawizê û li meydanan girtin, her wiha darvekirinên meydanî re man. Wan rehm li ciwan û pîran nekir, heta êrişî sembolên olî jî kirin.

### Komkujiyên herî hov

Komkujiyên ku li dijî elewiyan jî tên kirin, yekem nîn in. Li Sûriyê ji dema şerê navxweyî dest pê kiriye ve heta niha, Elewî dibin hedefa HTŞ'ê û komên çeteyan. Bi taybetî li cihên ku Elewî lê dijîn, bi dehan komkujî çêbûn. Li herêmên Elewiyan ên Idlibê, bi salan di bin dorpêça HTŞ'ê de man, ji sala 2017'an ve heta niha, herêmê şahidî ji komkujiyên herî hov re kir. Elewiyên sivîl ji aliyê çeteyan ve hatin revandin, ji bo fîdyeyê rehîn hatin girtin, hinek ji wan li ber çavên mirovan hatin kuştin.

### Dest datînin ser mal û milkên mayî

Hikumetekî bi vî rengî wê çawa Sûriyê bi rêve bibe û hemê pêkhateyên lê dijîn di nava xwe de bihewîne. Ger perçeyek ax, mekanek were valakirin, bêguman li cihê wê alternatîfek tê dîtin. Hewl didin Elewiyan ji cihê wan derxin, kesên din bi cih bikin. Jixwe mal tên valakirin, dest datînin ser mal û milkên mayî. Rewşeke wiha heye. Çeteyên ku li pêş çavên cîhanê gelek tiştan kirin niha li Sûriyê ne. Dewletek xistin nava destên çeteyan. Bi kîjan aqilî ev yek hat kirin, mirov nikare fam bike. Mirov nizane li pişt vê yekê çi heye û dê çi jê derbikeve. Bang li mirovan kirin û gotin çekên xwe berdin, teslîm bibin dê her tişt çêbibe. Bi wê yekê mirovan bê çek kirin û dûre komkujiyên wiha çêbûn.



### 'Rê li ber alîkariyê girtin'

Di vê çarçoveyê de Rîm El-xecirî ku yek ji pêkhateyên Dûrzî ye, ji Rojnamrya me re destnîşan kir ku dorpêçek aborî ya dijwar li ser wan tê ferz kirin û wiha anî ziman: "Ji destpêka ku hikumeta veguhêz a şamê hat ser desthikatdariya Sûriyê, dest bi komkujiyan kir, şûna ku bibe cihê çareseriyê û aştî bi xwe bîne, berovajî wê rewşa Sûriyê ber bi xerabûnê ve çû û aloztir bû. Bi hezaran pêkhateyên Dûrzî dan kuştin, bê sûc û bê sedem, ev kiriyar û sûc tu carî wê neyên qebûlkirin. Ewqas komkujî pêk anî û hîn jî dilê xwe rehet nekiriya ku heya roja îro em di nava dorpêçekî giran de dijîn. Rê li ber alîkariyê girtin. Her kesê ku hewl dida bikeve Suweydayê an jî derkeve, di bin xetereya kuştin an revandinê de ye. Tewar piştî vekişîna xwe jî, wan xwarin û pêdiviyan ji bazar û malan didizîn, darên zeytûn, sêv û tirî dibirin û xanî bi makîneyên giran hilweşandin. Ev hewldanek sîstematîk bû ji bo birçîkirinê, ne tenê ji bo rêgirtina li alîkariyê. Xwendekarên zanîngehê nekarîn beşdarî dersan bibin. Welatî niha bi zindîmanê ve mijûl in û yên ku dikarin hewl didin ku alîkariya cîran û malbatên xwe yên ji birçîbûn û koçberiyê dikşînin, bikin."

### 'Kuştin û kiryarên dijmirovî hîn jî berdewam in'

Rîma El-Xicerî di dawiya axaftina xwe da zanîn ku heya roja îro kiryarên dijmirovî li dijî durziyan pêk tê û wiha domand: "Heya niha gelek malbat ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê vet ê kuştin, di heman demê de tên revandin. Wekî din her ku bav ango kalekî Durzî dibîni sembêlên wan didin jêkirin, hemî kiryarên dijmirovî didin meşandin, ev yek jî dide diyarkirin ku çiqas kîn û nefreta wan ji pêkhateyên Dûrzî re heya. Lê ev nêzîkatê jî wê me need şikandin, heya ku yek ji me hebe emê li ser piyan bin, her wiha em ê doz û rûmeta xwe bi parêzin."

### 'Parçeyên canê Elewiyan didin firotin'

Di heman demê de Fatin Xedûr yek ji jinên Elewiye, da xuyakirin ku artêşa Colanî li ser nasnemeyên pêkhateyan komkujî pêk têne û wiha pê de çû: "Artêşa Colanî dema ku dibînin li ser nasnameya kes nivîsandibin ji pêkhateyên Elewiye wan qetil dikin, di heman demê de wan ji malên wan dibin û piştî 3-4 rojan agahî didn malbatên wan ku werin li nexweşxaneya Elwelîd zarokên xwe bigirin, dema ku malbat diçû tenê cenazeyên zarokên xwe tanîn, bi vê yekê girêdayî parçeyên canê wan jî dibirin. Ev yek kesên hov jî nakin, em rastî gelek karîsetan bûn, dema ku Rêjîma Baas hat helweşandin, her kes digot helwişîna Rêjîma Baas helwişîna zilm û zorê ye, lê mixabin berovajî vê yekê ku rêjîmek ji rêjîma Baas zalmtir û zortir hat. Ti kes nema bi ewleyî û bawerî jiyan dike, setpêkê hiştin ku her kes ji me çekê xwe deyine ku qaşo rêjîmeke bi ewle hatiye, lê ev hemî ji bo me mîna kemînekî bû, ew amûra ku em xwe pê bi parêzin jî nema, êdî bi rehtî hatin li ser Elewiyan komkujî pêk anîn."

### 'Jin li bazara El-welîd tên firotin'

Fatin Xedûr di dawiya axaftina xwe de balkişand ku gelek jin li bazara bi navê El-xenasîn tên firotin û wiha got: "Di pêvajoya ku Ev hikumeta veguhêz a Sûriyê hat li ser desthiatdariyê, gelek jin hatin revandin û bi taybetî jî jinên Elewî, Durzî û xiristiyanî. Heya niha agahiyê gelek malbatan ji keşên wan tune ne, piranî jinên ku tên revandin li bazara bi navê El-xenasîn tên firotin. Çawa ku DAIŞ jinênn Êzîdî dide firotin. Piraniyên van kesên ku van kiryara didin meşandin, ne Sûrî ne, gelek kesên beyanî di nava artêşa Colanî de hene û diyar e ku ev DAIŞ bûn, ji ber ku heman rêbazî niha li ser serê me tê kirin. Helbet heya niha tu kes xwedî li me derneket û bi ewlehiya me nefikirîn, tenê Rêveberiya Xweser û QSD`ê bû cihê ewlehî û baweriya me. Kesê ku dibe sedema parastina me, helbet em ê piştgirya wan bikin, QSD`ê ji bo me bû hêza parastin, Ewlehiyê û romet e me. Em bawerin ku çawa ew jinên êzîdî ji wan hovên DAIŞ`ê rizgar kirin wê rojekî jinên me jî bi destê wan werin rizgar kirin."

# Wezîr Parlak: Demokratîkbûna Tirkiyê bi çareseriya pirsa Kurd dibe

**Parlementerê Colemergê Wezîr Parlak diyar kir ku eger dewleta Tirk dixwaze bi Kurdên li Tirkiyê re pirsa Kurd çareser bike ku hemû gel û baweriyên Tirkiyê hevpar di welat de bijîn, hewceye zagoneke li gel gelên aştîxwaz û demokratîxwaz derbixînin û gavan biavêje, wê demê astengiya demorkatîkbûna Tikriyê namîne û got, "Hewceye her kes wek Rêber Apo rola xwe ya dîrokî bîne cih ku çareseriyeke mayînde çêbibe."**

Ronahî Sadûn

Derbarê siyaseta ku li Bakurê Kurdistanê ji aliyê dewletê ve tê meşandin, herwiha avakirina Tirkiyeke demokratîk wê çawa be, Parlementerê Colemergê Wezîr Parlak bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpevîn wiha bû:



**Niha çi siyaset li Bakurê Kurdistanê tê meşandin û zimanê dewletê çawa ye?**

Berî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk li Bakurê Kurdistanê zext û zordariya li ser gelê Kurd zêdetir bû ku rojek nebû mafê gelê Kurd neyê binpêkirin. Piştî pêvajoyê polîtîkayên dewletê û desthilatdara AKP û MHP'ê li dijî gelê Kurd kêm bûye û di formata xwe de hatiye guhertin. Lê her çiqas êrişên li ser gelê Kurd kêm bibe jî, bi awayekî cuda berdewam dike, ji ber li Bakurê Kurdistanê polîtîkayên şerê taybet tên meşandin. Îro li gelek bajêran êrişên li ser jinên şînên gerîla berdewam dike. Herwiha madeyên norkolîk di nava civakê de zêde bûye, ji ber dewlet rola xwe nalîze, bûye sedema ku roj bi roj her kes madeyan bi kar tîne, difroşe û zêde dibin.

Ciwan, jin û civaka gelê Kurd di vê pêvajoyê de xwe birêxistin dikin û çi bi destê wan de tê, dikin. Ev rewş rewşa Bakurê Kurdistanê ye. Lê piştî Rêberê Gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan banga Aştî û Civaka Demokratîk kiriye û manîfestoya civaka demokratîk derveye ku ji bo gelê me şandiye, bi hezaran civînên gel hatin lidarxistin û bi hezaran derdorên binî bi gelê Kurd re pêwendî li ser pêvajoyê dane çêkirin. Demekê dirêje hemû saziyên me jî li ser manîfestoya demokratîk xwe nû de ava dikin, da ku bi pêvajoyê re bibin bersiv. Roj bi roj jî li hemberî bangewaziya Rêberê Gelan Rêber Apo, gelên Tirkiyê ku bibin bersiv, dengê xwe zêde kirine, gelên Tirkiyê jî bi çavên wan bi pêşnegiya gelê Kurd e. Lê dewleta Tirkiyê ziman û siyaseta xwe neguhertine. Guherandin jî dê bi dîplomasî û têkoşîn çêbibe. Heta niha gelek pêngavên ku me li wan dane avêtin jî, me bi têkoşîna xwe daye avêtin.

**Tirkiyeke demokratîk wê çawa bê avakirin?**

Destpêkê hewceye dewlet û desthilatdarên dewletê rêve dibin ew buyerên nexweş ên ku vê sedsalê qewimîne baş bibînin û biryara demokratîkbûnê bidin. Dema dewlet xwe amade bibîne ku demokratîk bibe, piştî vê amadebûnê jî bihêsantir bibe. Astengiya herî mezin pêşiya dewleta Tirkiyê ku demokratîk bibe, pirsa Kurd e. Ji ber sedsal e gelê Kurd bi destê dewletê tê înkarkirin û hebûna gelê Kurd nayê qebûlkirin. Gelê Kurd li hemberî polîtîkayên dewletê yên qirkirinê ku hebûna xwe bide qebûlkirin, têkoşîneke bêhempa daye meşandin. Di heman demê de Tevgera Azadiya gelê Kurd 52 salan têkoşîneke rêve dibe ku pirsa Kurd bi diyalogê bê çareserkirin û Tirkiyê jî demokratîk bibe. Gelê Kurd mafên ku ji bo gelê xwe dixwaze, ji bo gel û baweriya Tikiyê hemû yan jî dixwaz in. Heger dewlet bi Kurdên li Tirkiyê re pirsa Kurd dixwaze çareser bike û hemû gel û baweriyên Tirkiyê hevpar welat bijîn, hewceye zagoneke li gel gelên aştîxwaz û demokratîxwaz derbixînin û pêngav biavêje, wê demê astengiya demorkatîkbûna Tikriyê namîne.

**Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk li Bakurê Kurdistanê çi guhertin pêk aniye û guhertinên hîn tên xwestin çi ne?**

Giştî sedsal e û bi taybetî jî 52 sal in li ser gelê Kurd zext û zordariya dewletê heye. Gelê Kurd têkoşîna xwe li ser du lingan rêve dibir, yek ji bo azadiya xwe, du jî ji bo aştiyeke mayînde, meşandiye. Bangewaziya Rêberê Apo rola gelên Kurd ên Tikriyê û Rojhilata Navîn zêde kiriye. Bi têkoşîna gelê Kurd hatin û çûna Îmarliyê vê sedsalê careke din gelê Kurd bi Rêbertiya Rêber Apo derxistiye li ser dikê. Yek caran li Tirkiyê piştî bangewaziyê derfeteke azad çêbûye ku pirsgirêkên Tiriyê bên nîqaşkirin. Piştî bangewaziya Aştî û Civaka Demoratîk her derê mijara gelê Kurd li gel demokratîkbûna Tirkiyê û demokratîkbûna Rojhilata Navîn tê axaftin û nîqaşkirin. Ev derfet piştî bangewaziyê çêbûye, em jî vê gelek girîng dibînin, ji ber berî vê bangewaziyê kes nikarîbû ewqas zelal vê mijarê nîqaş bike yan jî bi gotinên Rêber Apo bighêje civakê, ewqas derfet nebûn. Di heman demê de hatin û çûna hemû partî, sazî û derdorên cudatir piştî bangewaziyê zêdetir bûye, berê de ewqas kes hatin û çûn çênedibû. Bi çi caran wekî îro siyasetmedaran li ser gelê Kurd û Rêber Apo felsefeya paradîgmaya Rêber Apo nexwendibûn. Yek caran parlameto de komîteyek ji bo çareserî ava dibe û dikeve dewrê de ku dixwazin fikir û ramanên Rêber Apo hîn bibin û zanbin ka gelê Kurd ji bo pêşerojê çi dihizir in. Çiqas kesên nijadperest bixwaz in pêvajoyê têk bikin, yên aştî û çareseriyê dixwazin ji wan zêdetir in, roj bi roj zêdetir jî dibin. Herî girîng ji piştî bangewaziyê ew e ku çiqas kes jiyana xwe dest neda, ji ber ku di vê pêvajoyê de destkeftiyên herî mezin ev e. Di pêşerojê de dê nêzîkatiya di nava gelên Tirkiyê de baştir bibe, ev dem dibê ku her kes pirsgirêkên xwe bi diyalog çareser bikin, ev pêvajo dibe sedema wê jî.

**Ger pêvajo bi ser bikeve wê çi qezenciyan bi xwe re bîne, herwiha ger îhtîmala ku pêvajo neçe serî pêk bê, wê çi derkeve holê?**

Pêvajo wê bighêje armanca xwe. Destpêkê divê têkiliyên di nava gelên Kurd û Tirkiyê de yên ku du sedsal e xirab bûye, bên çareserkirin. Ev çareserî jî wê ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn pêşerojeke azad û bê şer bi xwe re bîne û dê ev çareserî jî di nava Rojhilata Navîn bibe mînak û li pêşiya şerên din ên ku biqewime, bê girtin. Dawiya vê pêvajoyê di Rojhilata Navîn de, pêvajoyeke demokratîkbûna Rojhilata Navîn dest pê bike. Êdî nema tu kes berê xwe bide dewleteke cudatir ku bi cihê xwe koçber bibe. Hem jî wê têkiliyê dewletên Rojhilata Navîn bi hev re zêdetir bibe. Pirsgirêka nasnameya gelê Kurd jî namîne, wê her wekî gelên cîhanî gelê Kurd jî cihê xwe dê bigre ku siyaseta xwe ya çareseriyê bi dîplomasiyeke xurt dikare bimeşîne, ew derfet çêbûye. Ya din di her qada jiyanê de dikare xwe azad rêxistin bike, herwiha têkoşîna azadî û demokrasiyê bimeşîne. Gelên Kurd dema pirsgirêkên xwe çareser kirin, itîfaqa netew jî mumkin bibe. Heger çareserî çênebe, destpêkê ji bo gelê Kurd û piştre ji bo dewleta Tirk baş nabe. Ev jî dê bibe sedema şerekî mezintir li Kurdistan, Tirkiyê û Rojhilata Navîn. Ji ber vê yekê her kes wek Rêberê Gelan Rêber Apo hewceye ku rola xwe ya dîrokî bîne cih ku çareseriyeke mayînde çêbibe. Heger ev çareserî çênebe, pêşeroja hemû gelên Rojhilata Navîn di tarîtiyê de bimîne. Ji ber vê yekê gelên Tirkiyê, gelên Kurdistanê, gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn ji ber zêdetir xwedî li vê pêvajoyê derdikev in.




## FENER



### Rakirina Qeyser Destpêka Pêvajoyek Ceosiyasî Ya Nû Ye

Idrîs Henan

Rakirina qanûnê Qeyser ê sala 2019an li ser Sûriyê hatibû ferzkirin, minewreyek ceosiyasî û vesazbûneke nû ji têkîliyên DYE li Rojhilata Navîn û Sûriyê re ye. Li şûna sizayan, sîstemek çavdêriya siyasî bi raportên spandî ferz dike. Lew re, ne gavek teknîk e, pêvajoyek nû di stratejiya DYE de ye ku navbera sivikirina zextên aborî û parastina serweriya ewlehî û siyasî de tev digere.
Berî her tiştî divê mirov bi şîroveyên şaş xwe nexapîne û bi rêbazên desthilatdariya HTŞ şîrove neke. Di serî de bi rakirina sizayên Qeyser re, siza ranabin, lê belê furma sizayên kevin ku nekariye rejîma Esad ne jî hevbendiya koma Astana biqedîne, guhertiye. Rakirina Qeyser, normên pratîzekirina sizayan ji çarçoveya giştî xiste çarçoveyek teng û cîbicîkirinê tekûztir dike. Yanê rakirin û ji nû ve ferzkirina sizayan, êdî li gorî reftarên HTŞ yên siyasî û ewlekarî ye. Ji ber vê jî, raportên şeşmehane ku rêveberiya DYE binivîse ne protokolek in lê belê mekanîzmayek nirxandin, zext û lêvegerê ye ku kîjan demê de be, siyaseta DYE di ber çavan re derbas dike. Amerîka bi wan pîvanan re nexşeya hebûn û girîngiyan li herêmê û Sûriyê ji nû ve xêz dike. Yekem xalên pîvanan; têkoşîna li dijî terorê û hevkariya ewlehî ye. Îsrara DYE ku HTŞ di şerê li dijî DAIŞ de zelaltir be, armancek stratejîk e ku rewatiya hebûna wê li Sûriyê ji nû ve pênase dike.
Bi xala duyem re jî HTŞ mecbûr dike ku çekdarên biyanî ji Sûriyê derxîne, dixwaze çavdêriya xwe li ser bunyada desthilata Şamê firehtir bike û bi awayekî veşartî hewl dide hegemoniyên biyanî di hundirê sazî û dezgehên dewletê de bê bandor bike. Bi xala sêyem re jî, DYE dixwaze projeya xwe ya siyasî ya nû ji bo pêşeroja Sûriyê pêşkêş bike ku hedê mafê mirovan derbas dike û Sûriyeya nû li ser bingehên têgihajtina pirrengiyê ava dike û ji hiqûqê pirtir dê bi statuyên destûrî re maf û nûnertî werin parastin. Bi gotinek din; endazyariyek nû ji siyaseta Sûriyê re ye. Pîvanên DYE ewlehiya Îsraîlê û hevkarên wê li herêmê ji bîr nekirin û bi xala çaremîn re jî ew yek tekûz kir ku divê HTŞ li dijî cîranan û taybet Îsraîlê şer neke û parastina ewlehiya wê jî şertekî têkîliyên pêşerojê ne. Çi tade yan êrişek aliyê Sûriyê ve pêk werin, wê siza ji nû werin ferzkirin. Xala pêncemîn jî şîrovekarên HTŞ xwe di ser re davêjin û dema qalê bikin jî, bi zanebûn naveroka wê diguherin. Ew xal jî girêdayî bicihanîna peymana 10 Adarê ye. Yek ji xalên siyasî yên girîng jî ew e ku piştgiriyê dide statuya siyasî ya Bakur û Rojhilatî Sûriyê, rê li ber destwerdan û xeyalên Tirkiyê yên guherîna demografîk digire, hevalbendê xwe yê pêbawer di şerê li dijî DAIŞ de diparêze. Diyare bi vê xalê re jî asoyên Sûriyeya nenavendî ya pêşerojê jî xêz dibin.
Bi xala şeşemîn re, DYE sîstema aborî li Sûriyê bi çavdêriyek darayî ya navdewletî re girêdide û li gorî şertên xwe pêşeroja sîstema darayî li Sûriyê diyar dike ku çavdêriyê li fînansekirina terorê, belavbûna çek û cebilxanê û spîkirina peryan kontrol dike.
Bi xala heftemîn re jî carek din tekezî li girîngiya têkoşîna li dijî hilberandin hebeyên hişber ên Kaptagonê û bazirganiya wê dike. Yanê ev xal kiriye şertek danûstandina bi civaka navneteweyî re ku gefek ewlekariyê ye.
Xala heştemîn jî, ji raboriyê pirtir balê dikişîne ser reftarên dewleta pêşerojê, bi vê yekê re jî hewl dide deriyên lihevhatinên siyasî yên gengaz li Sûriyê veke û lihevhatinek siyasî ku eserên 2011an paşguh dikin, ava bike. Rakirina sizayên Qeyser wê destpêkek nû be ku wê cidiyeta HTŞ bipîve ka heya kîjan radeyê dilsozê avakirina Sûriyeya pirreng û demokrat e.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Can Yûsiv

Helbestvan Sîmav Efrîn
"Helbestvana darên zeytûnan, nasname û dengê Efrîna birîndar."
Jina Kurd ji destpêka dîrokê heta niha gav bi gav li kêleka mêr dimeşe, xem û çarenûsa wî parve dike û bi wî re bi hemû cesaret û wêrekî di şerê jiyanê de dimeşe. Tu carî ne kêmtir bû ji wî, lê belê di têkoşîn û nivîsandinê de, li meydanan û fedekariyê de ji bo xak û rûmetê ew hevrêya wî bû.
Hin helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên jin di qadan de ew li pêşiya jinan bûn, di nava tarîtiya bindestî û kevneşopiyê de wan pencereyên hişyariyê vekirin û tovên azadî, zanîn û afirîneriyê di rihê zayenda xwe de çandin ,tevî karesatên ku li ser wan de hatine kirin, zilma civakê û zextên dijmin û malbatê jî îradeya wan nehat şikandin , wan êş kirin hêz, bêdengî kirin deng û birînan kirin helbestek jîndar.
Wan pênûsên xwe kirin çek li hember hewildanên tinekirin û piştguhkirinê, û gotin kirin çeperek ku bîr û nasnameya welat ji windabûn û pijavtinê biparêze.
Di nava van jinan de stêra helbestvana Kurd Sîmav Efrîn diçirise ,ku helbest kir welatek û riste kir rêya têkoşînê, wê xîmava pênûsa xwe ji bi xizmeta doza gelê xwe û parastina zimanê resen û nasnameya wî ya neteweyî terxan kir.
Li feraşînên Efrînê û di himbêza geliyên bedew ên çiyayê Kurmênc de bajarekî ku bêhna dîrok û şaristaniyê jê dibare, li ser zinar û kevirên xwe mîrateya Mîtaniyan û Hûriyan hildigire û di nav çiya û deştên xwe bîranîna bîhnxweşiya Med û Suberan werdigire,ew bajarê ku hertim bûye cihê kombûna tîp, huner û muzîkê, û mêrga çanda resen a kurdî, bajarekî ku tu carî serî li ber bahozên zemanan netewand, lê sekneke pêdarî li gorî resenî û mîrateya xwe ya kûr radiweste.
Di vê degûşa dewlemend a mîrateya çandî û şaristanî de , helbestvana Kurd Kubar Hawar (Sîmav Efrîn) di sala 1984'an de li gundê Şêx, yê ser bi navçeya Recoyê, ji dayîk û bavek Kurd (Mihemed û Solî), di nav malbateke kurdperwer a neteweyî û xebatkar de, ku ji şeş bira û sê xwîşkan pêk dihat, hatiye dinyayê.
Dê û bavê wê di dilên wan de hezkirina ji bo axê û dilsoziya bi welat re, û nirxên resen ên kurdayetiyê di dilê wan de çandin mîna dilsoziya ji kokê re, pabendbûna bi nasnameyê ve û hewildana berdewam a ji bo parastina mîrata çandî û zimanî ya kurdî.




Sîmav di hembêza xwezaya şênber a Efrînê de mezin bû, ku bêhna nêrgizan bi sira bayê zeytûnan re tevlihev dibe, ew cihê ku bi huner û awazê dijene, û di her kûşe û gundê wê de jiyan tijî dibe, ku awaz bi sira bayê re hev himbêz dikin, û xweza bi helbestê re di dîmenek tijî bedewî û germahî li hev kom dibin.
Li ser çiyayê Hawarê, li nav warên bedew ên gundê xwe de Sîmav zarokatiya xwe derbas kir; wê guh dida dengên xwezayê, awazên tilûran û xuşîna avê, li sirûdên jinan di zeviyan de û stranên şivanan di mêrgan guhdar dikir, wê bênxweşiya xaka bi bêhn dikişan, û li zeviyên berfireh û çiyayên bi heybet ên ku bûne şahidê şaristaniyên berê temaşe dikir , ku di giyanê wê de hestê hunerî, hezkirina helbest û wêjeyê ji piçûkatiya wê de çandin.
Li wir, di navbera germahiya xwezayê û aramiya gund de, û di navbera kuçeyên Efrînê û taxên wê yên kevnar de, wê dest bi berhevkirina tîpan kir wek ku zarok kulîlkên çolê berhev dikin, û guhdar dikir li pistîna ku çiya ji giyayan re vedibêje, û li stranên ku ba ji gundên dûr dibarîne, lewma gotin ji destpêkê ve welatek e piçûk bû ew di hewand e .
Sîmav di nava vê tevgera bedew ya dîrok, erdnîgarî û çandê de hatiye dinyayê; gotinên wê ji destpêkê ve nîşana hezkirina wê ya ji bo welat û nasnameya wê bû, û berdewamiyek bû ji bo tiştên ku dê û bavên wê di dilê wê de çandibûn mîna rûmet girtin bo mirasa Kurdî û têkildarî bo nasnameya neteweyî.
Meyl û hewesa wê ya edebî û rewşenbîrî ji zû ve dest pê kir, dema ku ew zarok bû ne zêdeyî deh salî bû, û ew bi kûrahî di bin bandora jîngeha dewlemend a derdora xwe de mabû - jîngehek ku bi ruh û huner tê pîroz kirin, dagirtî bi çîrok û stranan û ji her alî ve bêhna wêje û çandê jê dibare.
Nivîskar û torevanên kurd ên klasîk, yên wekî Cegerxwîn, Ehmedê Xanî û Mela Cezîrî ,roleke mezin di çespandina hişmendiya wê ya edebî de hebûn, herwisa xwendina wê ji berhemên nivîskarên navneteweyî û ereb re jî bandoreke mezin li ser rêwîtiya afirîneriya wê kiribûn.
Wê peyvên helbestên xwe vedihûnand
ji çîrokên ku hevrêziyê dikin di navbera efsane û dîrokê de ku dapîran li ser qehremaniya bav û kalan û berxwedana wan li dijî dagirkeran digotin û ji stranên kurdî yên ku evînê, berxwedan û hesreta welat zindî dihêlin, awaza yekem a jiyanê di hundurê wê de çêbû û hesta helbestî di wijdanê wê de bi cih bû..
Sîmav ji xuşîna robaran, xumxuma sulavên Meydankê, ji çîvçîva çivîkan, ji awazên jinan di dawetan de, û ji stranên palevanan di demsala çinînê de, xêzên pêşîn ên helbestê vehûnand , ew bi hesret dinivîse, û peyvên xwe bi tîrêja rojê û bêhna axê, dixemilîne , ji lewra helbestên wê dibin neynika ruhê axê û sirûdeke bîra Kurdî ya ku qet namire.
Wê taybetiyên hişmendiya xwe ya wêjeyî û ruhê neteweyî
ji şûnwarên kela Sim'an, bermayên Basûfanê û şikeftên çiyayên Lîlûn û Hawarê yên ku şahidî ji şaristanî û çandên kevnar re kirine, wergirte.
Xweza mamosteyê wê ya yekem bû , defterên wê bûn zevî û pênûsên wê bûn tîrêjên ronahiyê di serê sibêyên bêhnxweş de.
Wê xwendina xwe ya seretayî, amadehî û navîn li bajarê Efrînê qedandiye û ji temenekî biçûk de dest bi nivîsandina helbestê bi zimanê erebî kiriye, ji ber ku fêrkirin û hînkirina zimanê kurdî li Rojava ji aliyê rêjîma Beis a Sûriyê ve qedexe bû.
Bi destpêkirina Şoreşa Rojava li Efrînê ,ew tevlî Saziya Zimanê Kurdî (SZK) bû û li wir fêrî sê astên ziman bû. Piştre dest bi nivîsandina helbestan bi zimanê Kurdî kir, û karê xwe weke mamostetiya zimanê Kurdî li dibistanên Efrînê berdewam kir.
Helbestvan Sîmav bi zimanê kurdî û erebî helbestan dinivîse û wan werdigerîne û bi dengê xwe yê xweş û germ dixwîne , dengek ku jiyaneke nû û wateyeke din li nivîsên xwe zêde dike.
Wê helbesta kurdî bi hemû şêweyên wê nivîsiye, ji helbesta kilasîk a bi rêzbend û kêşe , heya helbesta azad û nûjen, ta bighêje helbesta Hayko,helbesta stranbêjî û gelêrî jî .
Hinêra wê tenê bi ristina helbestan ve sînordar nema, lê afirîneriya wê derbasî cîhana vegotin, roman û kurteçîrokan jî bû.
Nivîsên wê hatine wergerandin bi zimanê Erebî, Îngilîzî, Fransî û zaravayê Soranî û hatine hezkirin di nav xwendevanên bi çandên cuda de.

Her weha çend helbestvanên Kurd jî helbestên wê bi dengên xwe xwendine; mîna:(Ayşe Şêx Sîdî, Şehrezad Şêx Sîdî, Baran Hiso, Mezher Saîd, Eyhan Demîr, Ronî Efrîn û yên din).
Di nav berhemên wê yên edebî de, pênc dîwanên helbestî bi zimanê Kurdî hatine çap kirin:
1. Pişka Bin Giyan – 2021, Çapxaneya Ava.
2. Reşzeytûn – 2022, Çapxaneya Şelêr.
3. Sîmirbazî – 2024, Çapxaneya Şelêr.
4. Kirasê Binefşî– 2025, Çapxaneya Nûs.
5. Landika Nêrgizan – li benda çapê ye.
Her wiha sê dîwanên helbestî ên elektronîk weşandine , du ji wan bi kurdî ne û yek jî bi erebî ye û ji bo zimanê îngilîzî hatine wergerandin:
1. Hêviyên min.
2. Êşa netewî.
3. Maçek bi devê zeytûnê.
Mijarên dîwanên Sîmav cur bi cur in di navbera hesret û sirgûnê, nasname û jinbûnê, welat û bîranînê de ne, bi rêya wan re serpêhatiyeke helbestî ya rastî pêşkêş dike, ku zelaliyê bi kûrahiya mirovî re digihîne hev û bi riya wê ruhê jina Kurd, ku di xak, xewn û helbestê de rehên xwe berdayîn nîşan dide.
Sîmav di nivîsandina helbestên stranbêjiyê, terazû û rêzbend de afrîneriyê dike ,
gelek hunermendên Kurd helbestên wê kirine stran û gotine mîna Hunermend: (Mem Alan " Koma Zozan", Mezher Seîd, Mihemed Osman,
Aras Agirî, Ridwan Husên,hunermend Newroz Îbrahîm û Nûrjan..h.d).
Helbestvan Sîmav di encama keda wê ya edebî û afirîneriya wê ya zêde di warê helbestî û çandî de gelek xelat û bawernameyên pesindayînê wergirtine , mîna:
1. Xelata Navenda Berzanî ya Rewşenbîrî li bajarê Hanover, Almanya.
2. Xelata yaneya Hayko ya Kurdî.
3. Xelata Koma Zozan li Holinda.
4. Xelata Akademiya Aşîtî li Almanya.
5. Xelata komelya Fageşta li Swêd.
Her wiha gelek pîrozbahiyên rêzgirtinê ji platformên çandî û medyayî yên Kurd û Ereb li ser medyaya civakî wergirtine .
Sîmav hebûneke wê ya çalak û cihêreng hebû di dîmena wêjeyî û çanda Kurdî de bi saya dayîn û afirîneriya wê ya di nivîsandina helbestan de bi zimanên Kurdî û Erebî, ji lewra gelek kanalên televizyonê û malperên elektronîk bi wê re hevpeyvîn û diyalogên wêjeyî çêkirine , mîna:(Kurdistan 24, Zana TV, News, Cûdî 4, Çira TV, Sterk TV, Xelat TV, Welat TV, Çarpell TV, û Radiyo ARTA..)
Her weha, çend kovarên Kurdî jî hevpeyvîn bi wê re kirine mîna:( Eylem ,
Sîwan ,Şermola, Salona wêje ,Hêlma Çandî, Komeleya Efrîn ya Huner ,Kurdistanî Nû û yên din).
Di heman demê gelek helbest û gotarên wê hatine weşandin di yane û kovarên erebî yên eleqedar dibin bi Hayko û wêje yê re.
Sîmav beşdarî gelek yekîtiyên edebî û rêxistinên çandî bûye û niha jî endamê va ye:
1- Yaneya Hayko ya Kurdî.
2- PENA Kurdî.
3- Desteya Mafên Mirovan a Rêxistinên Horî û HWD.
Helbestvana Kurd Sîmav di sala 2004'an de zewicîye û dayîka çar zarokan e, ku ji bo wê kaniyeke hestyarî û îlhameke kûr a mirovî ava kirin, ku di germahiya helbestên wê û dilpakiya hestên wê de diyar dibe.
Piştî dagirkirina bajarê Efrînê ji aliyê artêşa Tirk û çeteyên wê ve disala 2018'an de, ew tevî malbata xwe bi darê zorê koçber bû û li pey xwe malbat , bîranînên zarokatiyê û xeyalên xwe hişt.
Di çavên wê de rodikên girî û di dilê wê de hezar derd û xem, hesreta malbat û mal û darên zeytûnan ên ku çîrokên ax û welat jê re digotin.
Sîmav bi şêwazeke helbestî ya taybet tê nasîn ku mîna bêdengiya wê ya hundirîn û germahiya taybetiyên wê, şêweyeke ku hevbexşiyê dike di navbera hestiyariya jinê û hêzbûna çiyayî, di navbera xewn û rastiyê de , û di navbera hesretê û serhildanê de ,zimanê wê di şêweyê xwe de de hêsane , lê kûre di wateyê de, helbestê dike neynika giyan û di heman demê de hawara mirovan.
Ew di helbestên xwe de bi gelek mijaran ve mijûl bûye: Li ser Efrînê û zeytûnan, sembola pêdariyê, li ser azadî û rûmetê, li ser Kurdistanê û bedewiya xwezaya wê nivîsiye ,her wiha li ser evîn û hezkirinê, li ser jinên Kurd û têkoşîna wan nivîsîye.
Simav ne tenê helbestvan û nivîskarek e, lê di qada edebî û çandî ya kurdî de çalakvanek çalak e ew hîn di xurtbûna dan û afirîneriya xwe ya wêjeyî de ye, helbestên xwe bi wêneyên helbestî yên herî xweş dinivîse, gotar û çîrokên xwe bi şêweyekî rûmetdar û bedew pêşkêşî dike û bi awayekî afirînerî werdigerîne , ji bo ku bigihîje girseya gel, û dengê wê yê wêjeyî bimîne heyî û nûvekar.
Ji wê re serkeftin û afirîneriya zêdetir dixwazim.

# Nangeha giştî ya bajarê Dêrikê: Kar û xebat

Rêveberê beşa hilberînê li nangeha giştî a bajarê Dêrikê Besam Yewnan diyar kir ku ew hemû hewildanên xwe dikin da ku nan bi qalîteyeke baş çêbikin û pêşkêşî welatiyan bikin.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**



Nangeha giştî a bajarê Dêrikê yekemîn û kevintirîn nangeh e ku li bajar hatiye avakirin û bi salan xizmeta gel kiriye.
Nangeh li ser du xetan hilberîna nan dike, xeta yekem ji seat 8'ê êvarî heya 6'ê sbehê ye û xeta duyem jî ji 6'ê sebahê heya ku hilberîna wan bidawî dibe. Di firngehê de 61 karmend cihê xwe digrin.
Di derbarê kar û xebatên nangeha giştî a bajarê Dêrikê de Rêveberê beşa hilberînê li nangehê Besam Yewnan ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên firingeha giştî

Besam Yewnan di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Di fnangehê de kar dabeş kiriye, 8 jin hevîr çêdikin, herwiha karmendên alavan hene her karmendek berpirsê alava ku di nav destê wî de ye. Lewma her roj dema çêkirina nan bidawî dibe karmendek alavan paqij dikin da ku pirsgirêk dernekevin. Bi giştî hijmara kesên ku cihê xwe di nangehê de digrin 61 kesin. Di heman demê de sê aş li cem me hene aşê Xêrat, Cezîrê û Hitîn, em ard tevlîhev dikin di encamê de nanê me baş dibe. Ji destpêka meha pûşberê ve karê me bûye kopiratîv, ev yek bi me re bû alîkar ku karmend bêtir bi karê xwe ve werin girêdan, di heman demê de kalîteya nan jî baştir bûye, dema kalîte baş bibe gel jî berê xwe dide nangehê lewma em hemû hewildanên xwe dikin ku xizmeta civakê bikin. Tişta ku dihêle karê me serkeftî derbas bibe hevgirtin û destekdayîna karmendan û rêveberiyê ji hev re ye. Piştî ku karê me bû koperatîv ji sedî 90 guhertin çêbûye ev yek dihêle ku rexneyên gel jî kêm bibe li ser me û razîbûna xwe nîşan bidin."

### Astengiyên ku derdikevin pêşiya karmendan



Rêveberê beşa hilberînê li nangeha giştî a bajarê Dêrikê Besam Yewnan axaftinên xwe wiha qedand: "Hêviya me ew e ku di sala nû de hin guhertin di nangehê de çêbibe di milê guhertina alavan de, ji ber ku hin alav li cem me hene hîn ji salên 80'î yê ve ne û dema ku xira dibin karê me asteng dibe. Herwiha hêviya me ew e ku ereberyek ji bo belavkirina nan jî were veqetandin, ji ber ku dema nan dimîne dibe hevîr dema erebe hebe em belav bikin nan di ser hev de namîne. Ji ber ku ev nangeh tenê di bajar de heye rojana em 13ton ard çêdikin, dema pirsgirêkek di alîkî de derdikeve karê me tevlêhev dibe. Daxwaza me ew e ji hemû gelên bajarê Dêrikê û gundewarên wê ku zanebûna wan di milê çêkirina nan de hebê berê xwe bidin nangehê û têde kar bikin, dema ew kes berê xwe bidin nanghê wê seatên kar kêm bibe û qalîteya wê baş bibe."

# Li kantona Cizîrê serjmariya sewaldariyê berdewam dike

**Lîloz Hisên/Qamişlo**



**Hevserokê Desteya Sewaldariyê ya kantona Cizîrê Mihemd Tahir Şêxmûs tekez kir ku xebata serjmariya sewalan ku di 27'ê Mijdarê de dest pê kiriye tê domandin û got, "Aramnca me belgekirina hejmara sewalan li tevahî herêmê ye."**

Kar û xebatên serjimariya sewalan ku desteya Sewaladariyê destpê kiriye; li herêma Cizîrê berdewam dike, armanca vê serjimariyê belegekirina hejamara gitşî sewalên li herêmê ye.
Ev lêkolîna berfireh beşek ji planeke berfireh e ji bo amadekirina datayeke dîjîtal ku dê alîkariya beşê aborî bike di pêşxistina bernameyên rast de ji bo peydakirina xwarin û dermanê sewalan, di heman demê de piştgiriya sektora sewalan bike.

### Mekanîzmaya xebata sejimariya sewalan

32 komîteyên taybet di nava Komîteya Çandinî û Sewaldariyê ya kantona Cizîrê de, wekî beşek ji yek ji mezintirîn kampanyayên belgekirinê yên li herêmê di van salên dawî de şahidî kiriye; karê xwe yê serjimêriyê li bajar, bajarok û gundên herêmê didomînin. Serjimarî qeydkirina hejmara pez, çêlek, bizin û mirîşkan dihewîne, bi armanca çêkirina qeydek berfireh ku hûrguliyên mezinahiya sewaldariyê nîşan dide.
Hevserokê Sewaldariyê ya Kantona Cizîrê, Mihemed Tahir Şêxmûs diyar kir ku ev serjimarî qonaxa sêyemîn a rêzeserjimêrên ku di sala 2017'an de dest pê kirine pêk tîne û wiha anî ziman: "Wê demê hejmara komîteyan kêm bû û xwe dispart komîn û Yekîtiya Cotkaran, ku di encamê de hin kêmasî di daneyan de çêbûn. Di salên 2021-2022'an de, komîte berfireh bûn û pêvajo bêtir rêxistin bû, lê hîn negihîştiye asta rastbûn û berfirehiya pêwîst."

### Komîteyên belgekirina meydanî

Di serjimariya 2025'an de, rêveberiyê pergalên elektronîkî yên nûjen bi kar anî ku xwe dispêre komkirina daneyan bi awayê kaxizan pişre bi awayekî rasterast tê veguhestin ji bo bernameyek navendî girêdayî kantona Cizîrê, piştre ji bo navendên lêkolînê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê.
Ev lêkolîn rê dide tesbîtkirina agahiyan bi awayekî rasterast û rê li ber manîpulekirin an dubarekirina daneyan digire, bi vî rengî kalîteya serjimêriyê baştir dike û wê rasttir û pêbawertir dike.
Mihemed Tahir Şêxmûs wiha domand: "Her komîteyek ji çar endaman pêk tê, ku temîsla aliyên sereke yên bi sektora sewaldariyê têkildarin; dikin, endamek ji komîteya sewaldariyê, nûnerek ji yekîtiya cotkaran, endamê meclisa bajar, wekî din kesê ku daneyan derbas dike di heman demê de agahiyan vedighurîne qeydkriina elktronîk. Ev cihêrengî daxwaza rêveberiyê di misogerkirina zelaliyê û beşdarbûna hemû aliyê têkildar; nîşan dide."

### Serjmarî li 300 gundî hat kirin

Kar û xebatên serjmariyê di çareçoveya pilaneke berfireh li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi çavdêriya Desteya Aborî û Mecalisên Çandiniyê li herêmê; tê kirim. Komîteyên kantona Cizîrê heya niha serjmariya nêzî 330 gundî kiriye di heman demê de kar û xebat berdewam dike bi armanca gihaştina hemû herêman bêyî îstîsna.
Ev xebat armanc dike ku hejmara Sewaldariyê destnîşan bike, ku ev lêkolîn bibe alîkar di danîna pilanên din ji bo peydakirina xwerinên ajalan û dermanên wê, li gorî meznahiya rastîn a sewaldariyê. Rêveberî hewil dide piştgiriyeke birêxistinkirî bide xwediyê ajalan dema girtina xwerin û dermanên ajalan di riya kartên elktronîk, bêyî tedbîrên kaxizan yên tevlihev an jî destwerdanên nerêkûpêk.





# Sînan Cûdî: Berjewndiyên Kurd û Tirkan di çareseriyê de ye

Sînan Cûdî da zanîn ku ger dewlet bi rastî dixwaze vê pêvajoyê civakî bike, divê herî kêm wêrek be ku girteka civînên bi Rêber Apo re tevahî belav bike. Bêyî vê, pêvajo di nav qadeke teng a ewlehiyê de asê maye û got, "Hin derdorên di nav hikûmetê de çareseriyê teng dikin ji bo sêgoşeya efû, vegera malê û bêçekkirinê de bi dest digrin. Ev nêzîkatî pirsgirêkên avahî û qanûnî di rêza duyemîn de dihêle."

**Zana Roj/Qamişlo**

Di derbarê pêşveçûnên pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, Rojnamevan Sînan Cûdî bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1-Piştî serdana şandeya komisyonê ji îmraliyê re û belavkirina kurteya qeydên hevdîtinê, di hundirê Tirkiyê de gelek nerînên cûda derketin, hûn qonaxa ku pêvajoya aştiyê gihiştiyê çawa dinirxînin?**

Di salekê de, nîqaşa siyasî ya li ser pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê guheriye. Destpêkirina Komîsyona Hevgirtina Neteweyî, Biratî û Demokrasiyê ya ku di Parlamentoyê de hatiye damezrandin, serdana şandeyê ya Îmraliyê ji bo hevdîtina bi Rêber Abdullah Ocalan re û xwendina kurteya vê civînê ji aliyê komîsyonê ve nîşan dide ku dewleta Tirk, kanalek ku demek dirêj girtî dihişt, ji nû ve vekiriye. Mijarên wekî bêçekkirin, vegera malê û efûyê cara yekem bi awayekî eşkere û giştî tê nîqaşkirin. Di heman demê de, siyasetmedar, pisporên hiqûqî û beşek girîng ji muxalefetê diyar kirine ku divê metna tevahî ya hevdîtinan were parvekirin.
Ev sal hîn ewqas pêşde neçûye ku em îdîa bikin ku "pêvajoya aştiyê vegeriyaye". Digel vê yekê, em ketine qonaxek ku dewletê derî vekiriye, civak dest bi şopandinê kiriye û raya giştî ya Kurd bi hêviyek hişyar temaşe dike.
Tiştê ku vê carê ferqê çêdike ev e: êdî pirsgirêk nikare tenê wekî "bila pevçûn rawestin, bila vegerin malê" were çareser kirin. Bîra civakî bi girîngî kûr bûye, aktorên siyasî guherîne û hevkêşeya herêmî bi tevahî cûda ye. Hem dewlet û hem jî siyaseta Kurd dizanin ku eger vê carê gavên pêwist neyê avêtin, pêvajo dê berî ku dest pê bike jî hilweşe. Ji ber vê yekê, tiştê ku îro diqewime wekî "ceribandinek rê" xuya dike, celebek ceribandina lêdanê. Lê ew di heman demê de asteke ku eger bi rêkûpêk were birêvebirin, dikare bibe deriyek sereke.



Şandeya Komîsyonê li Îmraliyê bi Rêber Apo re hevdîtinek pêk anî. Kurteya civînê li Parlamentoyê bi komîsyonê re hate xwendin û Komîsyonê got, "Me qonaxa guhdarîkirinê temam kir û em derbasî qonaxa raporê dibin." Metna tevahî ya civînê nehat weşandin. Hin beşên muxalefetê û tevgera Kurd daxuyaniya "kurteya civînê" wekî nêzîkatiyek ku pirsgirêkên baweriyê derdixe holê dîtin. Cihê ku em îro lê ne xalek destpêkê ye. Lê ew nazik e. Ji aliyekî ve, weşandina kurteya civînê şefafiyetê çênake; berevajî vê, gumanan derdixe holê. Ev ji ber ku di pêvajoyên bi vî rengî de di demên berê de manîpulekirina agahdariyê çêbûye. Ji ber vê yekê, civak êdî baweriya xwe bi tiştekî ku wekî "kurteya civînê" tê pêşkêşkirin nayne.
Ger dewlet bi rastî dixwaze vê pêvajoyê civakî bike, divê herî kêm wêrek be ku girteka civînên bi Rêber Apo re tevahî belav bike. Bêyî vê, pêvajo di nav qadeke teng a ewlehiyê de asê maye. Bi gotineke din, qonaxa heyî dînamîk e lê ne saxlem e. Îhtîmalek heye ku bibe platformek nû ji bo danûstandinan, lê tiştê ku ji bo vê kêmasî heye bawerî ye.

**2. Rapora komîsyona duyemîn dê di demek nêzîk de were pêşkêş kirin, lê partiya desthilatdar hîn jî pirsgirêkê wekî sînorkirî bi efû û vegera malê dibîne, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Amadekirina rapora komîsyonê berdewam dike. Lêbelê, hin derdorên di nav hikûmetê de çareseriyê teng dikin bo sêgoşeya efû, vegera malê û bêçekkirinê de bi dest digrin. Ev nêzîkatî pirsgirêkên avahî û qanûnî di rêza duyemîn de dihêle.
Kûrahiya dîrokî ya pirsgirêka Kurd di asta "birînek civakî" de ye. Kêmkirina pirsgirêkek wiha bo bangek hêsan a "vegera malê" tê wateya ku merov xwe bike ku êş û newekhevî qet çênebûne. Ev nêzîkatî pirsgirêkan demkî bêdeng dike lê wan çareser nake. Bi rastî, çareseriyek wiha dê di pêşerojê de bibe sedema şikestinên hîn girantir. Ji ber ku nasname, ziman, çand, mafê xweseriya herêmî, ewlehiya qanûnî û edalet xalên sereke yên vê pirsgirêkê ne. Ger rapor tenê li ser efû û vegerê be, pêvajo dê berî ku dest pê bike hilweşiyayî were hesibandin. Ji ber vê yekê, ez vê nêzîkatiyê wekî seranser û lewaz dibînim.

**3. Ji ber hesasiyeta pêvajoyê, divê dewlet çi tedbîrên yasayî bigire da ku îhtîmala xebata vê pêvajoyê zêde bike?**

Efû, vegera malê û bêçekkirin di rojevê de ne. Lêbelê, binesaziya yasayî hîn neguheriye. Pirsgirêkên qanûnên terorê, azadiya derbirînê, polîtîkayên wesayetê û nûnertiya siyasî berdewam dikin.
Tiştên ku dewlet hewce dike bike, dikarin di sê qonaxan de werin kurtkirin:
A yekê, nûkirina rêziknameya yasayî ye: Divê pênaseya terorîzmê were guhartin. Divê mekanîzmaya zexta dadwerî ya ku bi biryarnameyên qanûnî ve hatî afirandin were rakirin. Divê pratîka wesayetê were bidawî kirin. Divê qada siyasî were azad kirin.
A duyemîn, rizgarkirina mafên civakî ye. Divê mafên ziman, çand, nasname, rêveberiya xweser a herêmî û beşdariya demokratîk xwedî çarçoveyek zelal bin. Ev maf ne mafên takekesî ne, lê mafên civakî ne. Ji ber vê yekê, parastina qanûnî pêdivî ye.
A sêyemin jî damezrandina mekanîzmayan ji bo avakirina baweriyê ye. Divê mekanîzmayên wekî komîsyonên rastî û heqiqetan, bernameyên lihevhatina civakî û komîsyonên lêpirsînê yên windakirinên bi zorê werin damezrandin.
Ji ber ku bê edalet aştî çênabe. Bi kurtasî, eger gavên yasayî yên dewletê dereng bikevin, pêvajo dê têk biçe. Siyaseteke ku tenê xwe dispêre bêçekkirin û efûyê nikare barê vê axê hilgire.

4. Hêviyên ji dîyasporaya navneteweyî ya Kurd û aştîxwazan çi ne?

Civakên Kurd ên li dîyasporayê û saziyên mafên mirovan ên navneteweyî pêvajoyê ji nêz ve dişopînin. Nêzîkatiya avahiyên siyasî yên Ewropî ji bo pêvajoyê jî dikare diyarker be.
Hêvî bi rastî pir zelal e: divê pêvajo were şopandin, divê pîvanên qanûnî werin bibîranîn û divê zext li ser siyasetê were sivikkirin.
Dîyaspora û derdorên navneteweyî dikarin sê tiştan bikin: A yekî, ji bo şefafiyetê di pêvajoyê de zextê bikin. A duyem, çavdêriya mafên mirovan û qanûnî ya navneteweyî bi berdewamî di rojevê de bihêlin. A sêyem jî bernameyên civakî û çandî yên ku hevgirtina navcivakî xurt dikin pêşve bibin.
Ev pêvajo ne tenê danûstandinek di navbera Enqere û siyaseta Kurd de ye. Ew beşek ji veguherînek e ku bandorê li tevahiya Rojhilata Navîn dike. Ji ber vê yekê, rola tenê ya aktorên derveyî ne tenê temaşevan e; lêbelê, divê ew beşdarî xurtkirina binesaziya civakî ya aştiyê bibin.

**5. Gelo têkiliyên îro yên berdewam dikarin wekî beşek ji lêgerîna peymanek civakî ya nû li Tirkiyeyê were dîtin?**

Tirkiye di çar salên dawî de hem krîzên aborî û hem jî yên siyasî derbas kiriye. Sîstema îdarî bûye mijara nîqaşê û heta siyaseta sereke jî neçar maye ku reformên berfireh çareser bike. Nîqaşên li ser destûrek nû gelek caran germ bûne lê heta niha pêk nehatine. Lêbelê, pirsgirêka Kurd hîn jî xala biryardar a van hemî nîqaşên sîstemîk e. Têkiliyên Îmraliyê, xebata komîsyonê, weşandina qeydan, û amadekirina potansiyel a raporek di sala borî de hemî di vê çarçoveyê de derketine holê.
Şirovekirina van têkiliyan tenê wekî pêvajoyek aştiyê dê ne rast be. Bi rastî, dewlet dikeve serdemek ku tê de neçar e ku peymana xwe ya civakî nû bike. Ev ji ber ku pergala heyî êdî baweriyê çênake; serweriya hiqûqê qels bûye, çarçoveya temsîliyeta siyasî teng bûye û bingehên lihevhatina civakî hilweşiyane. Pirsgirêka Kurd ew dever e ku vê rewşê bi awayekî herî zelal eşkere dike. Ji ber vê yekê, her têkiliyek bi Kurdan re beşek ji hewcedariya pergalê ye ku xwe ji nû ve ava bike.

**6. Hûn di dawiyê de dixwazin çi bêjin?**

Pirsa rastîn a ku îro divê were pirsîn ev e: Gelo dewlet amade ye ku peymanek civakî ya nû çêbike? Ger bersiv erê be, ev ne tenê bi guhertinên destûrî ve sînordar e. Nasname, çand, mafê rêveberiyê, misogeriya qanûnî, dad û azadiya derbirînê hemî bi hev re têne çareser kirin. Ji ber ku heke civakek bixwaze xwe ji nû ve ava bike, ew nikare bi "efûkirina komekê" vê yekê bike.
Tiştê ku ez dibînim ev e ku di nav dewletê de li ser vê yekê nakokî heye. Lê gelo niyet hîn nehatiye destnîşankirin? Fikra peymanek civakî razîbûnê çêdike, û razîbûn tenê bi riya wekheviya rastîn û danûstandinên vekirî mimkun e. Ev tam ew e ku civaka Kurd îro li benda wê ye.
Bûyerên îro dikarin rê li ber şikestinek dîrokî vekin. Lê gelo ev şikestin ber bi aştiyê ve diçe, ev yek dê bi gavên yasayî yên ku ji hêla dewletê ve têne avêtin, şefafiyeta qeydan, berfirehiya rapora komîsyonê û beşdariya raya giştî di pêvajoyê de were destnîşankirin. Tirkiye êdî nikare vê pirsgirêkê bi rêbazên xwe yên kevn çareser bike. Berjewendiyên hem Kurdan û hem jî Tirkan di çareseriyekê de ne ku koka vê pirsgirêkê çareser bike û li ser bingeha garantiyên yasayî be.

# Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas, sînornas e

Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas rapora kiryarên li dijî rojnamevanên cîhanî ya salane belav kir, tê de jî kiryarên ku dewleta Tirk li ser rojnamegerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeşîne bi zanebûn paşguh kir. Paşguhkirin tê wateya ku ew rastiyan vedişêre û sînoran di navbera xwe û rojnamevanên azad de ava dike.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

### Rojnamevanên ku hatine hedefgirtin li seranserî cîhanê

Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas (RSF) rapora sala 2025'an di 9'ê Berfanbarê de belav kir. Di raporê de hate destnîşankirin ku li seranserî cîhanê di nava salekê de 67 rojnameger hatin kuştin. RSF'ê rapora li ser pêvajoya navbera 1'ê Kanûna 2024an û 1'ê Kanûna 2025an aşkere kir. Di raporê de Rêxistina Rojnemevanên Sînornenas destnîşan kir ku rojnameger ji ber kiryar û sûcên hêzên çekdar hatin kuştin û got: "Rojnameger namirin, têne kuştin, herwiha 135 rojnameger winda hene." Li gorî raporê, li tevahiya cîhanê li 47 welatan 503 rojnameger girtî ne. Welatên ku herî zêde rojnameger lê girtî ne: Çîn 121, Rûsya: 48, Myanmar: 47. Lê UNESCO'yê tekez kir ku di sala 2025'an de 91 rojnameger hatin kuştin di heman demê de li gorî UNESCO'yê jî di sala 2025'an de 91 rojnameger hatin kuştin.

### Kiriyarên xerab li dijî rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Wekî tê zanîn di dawih sala 2024'an de Sûriyê çavê xwe li ser guhertinekê vekir, rêjîm bi hikumeta HTŞ'ê hat guherandin herwiha ev guhertin xwedî bandor bû li ser Barkur û Rojhilatê Sûriyê. Li Bendava Tişrîn, Minbic, Şehba, Şêxmeqsûd, Eşrefiyê, Dêrhafir û hwd… êrîşên dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê hebûn. Da ku êriş û rastiya kiriyarên dagirkeriyê ji bo raya giştî were parvekirin, rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê erka şopandinê avêtin ser milê xwe. Di oxira erkdariya şopandina heqîqetê de jî rojnameger Nazim Daştan û Cîhan Belgîn di 19'ê Berfanbarê de ji hêla dagirkeriya Tirk ve hatin şehîdxistin. Hem jî hevreyê me yê rojnamevan Şervan Seydo di Sibata 2025'an de ji hêla dagirkeriyê ve şehîd bû. Herwiha piştî vê bûyerê dewleta Tirk a dagirker rasterast êrîşî sivîl û rojnamevanan kir û di encamê de nêzî 10 rojnamevan birîndar bûn. Ev kiriyarên xerab ên dewleta Tirk a dagirker li dijî rojnamevanan ji Berfanbara 2024'an heya Adara 2025'an hatin domandin.

### Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas, sînornas e

Dema ku îsal Rojnamevanên Sînornenas rapora xwe parve kir, bal kişand li ser rojnamevanên gelek welatan û rastiya qetilkirin, desteserkirin û hemû cûreyên kiriyaran eşkere kir. Lê wê bal nekişand li ser kiriyarên ku li ser rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin meşandin bi dirêjahiya sala 2025'an. Tekez e ku Rojnamevanên Sînornenas bi hemû kiriyarên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dizan û vê mijarê dişopîne, lê bi zanebûn li ser ranaweste. Ev yek jî tê wateya ku Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas çavê xwe li rastiyê digire, bi taybet di kuştin û birîndarkirina rojnamegeriya azad de paşguhkirin çêdibe. Gelo ev rêxistin sînornenas e di warê parastin û şopandina rewşa rojnamevanên cîhanê de, na, ew sînornas e. Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas bi vê bêdengbûna xwe dibe sînornas, di navbera xwe û rojnamegeriya azad de sînorekî ava dike. Di heman demê de ew dibe hevkara dagirkeriya Tirk di hedefgirtina rojnameger û rojnamegeriya azad a Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

### Pêwîst bi sînornenasî, parstin û şopandina rojnamevanan heye

Piştî rûxandina rêjîma Baas û pirbûna hedefgirtina rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) li asoyên



çareseriyê geriya. Bi armanca parastin û piştgiriya rojnamevanan, di 13'ê meha Adara 2025'an de Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan raghandin. Ragihandina Azad pêwistî dît ku Yekîneya Parastina Rojnamevanan bê avakirin û wiha berdewam. Di encama rewşa şerê ku Sûriyê tê de derbas bû, rojnamevan rastî gelek metirsî û xeteriyan hatin. Piştî rûxandina rêjîma Baasê û hatina hikumeta veguhêz jî hîna gef li ser rojnamevanan tên kirin. Rojnamevanên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwazin xwe bighînin herêmên tevahiya Sûriyê lê xeterî li ser jiyana wan heye. Bêguman xebata Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas derbarê şopandina rewşa rojnamevanên cîhanî dide meşandin gaveke baş e, lê dema ku rewşa tevahiya rojnamevanên cîhanî neşopîne û hedefgiritina wan diyar neke ew dibe hevkara hedefgirtinê. Lewma divê di serî de Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas li gorî pîvanên rojnamegeriya rast tevbigere, rastiyan nenuxîne kiriyarên ku li dijî rojnamegeran tên kirin, li kur bin, kî bin û îdiyoljya wan çawa be, divê sînor di navbera rojanmevanan û Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas neyê avakirin, bi taybet rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Kurdistanê. Li aliyê din divê têkiliyeke xurt di navber Yekîneya Şêwermendiya Ewlehî û Parastina Rojnamevanan û Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas de çêbibe da ku xeteriya li ser jiyana rojnamevanên Rojava, Kurdistan û Sûriyê were eşkerekirin û rojnamevan bên parastin.

# Koletî ji Israîl re, lê kîndarî ji Kurdan re

**Reşo Mihemed**

Piştî rûxandina rêjîma Baas bi salekê, bi taybet di roja salvegera wê de, gelên Sûriyê bi rêbazên cuda ev bone pîroz kirin, hin ji wan bi rêzdarî, hinan bi kîndarî û hinan jî ji ber kiriyarên ku li ser wan hatin kirin ji hêla hikumeta veguhêz bêbertek man. Lê pirsa me kîndariya ku ji hêla alîgirên hikumeta nû ve ye, kîndariya ku li dijî Rêveberiya Xweser, QSD û gelê Kurd di vê rojê de hate nîşandan. Ev yek bi zanebûn li tevahiya bajarên ku di bin siya hikumeta veguhêz ve çêbû, di mîting û meşên alîgirên hikumetê de siloganên kîn û nefretê li dijî QSD'ê û gelê Kurd digotin. Ya herî xerab ku hate kirin, li Dêrazorê çêbû, dema ku leşkerên Artêşa Berevaniya Sûriyê tevlî alîgirên xwe derketin qadan û gotinên xerab derheqê QSD'ê û tevahiya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di mîtingan de dan. Berpirsa sereke ji van kiriyarên wiha Berevaniya Sûriyê û hikumeta HTŞ'ê ye, armanc ew e ku gelên Sûriyê bikevin şerekî bêdawî û fitneyeke



mezin di navbera gelan de ava bibe. Derbarê vê yekê malpera fermî ya QSD'ê daxuyaniyek belav kir, QSD'ê da zanîn ku avêtina siloganên kîndariyê û dijîtiya QSD'ê heman hişmendiya rêjîma têkçûyî ye, herwiha armanca wê gurkirina agirê fitneyê di navbera gelên Sûriyê ye. Di heman demê de QSD'ê tekez kir ku ew xwedî rol e di parastina gelan de li hemberî xeteriya terorê û wê xîtaba kîndariyê nebe alavek di destê tu kesî ji bo tevlîheviyê û şerê navxweyî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Piştî rûxandina rêjîma Baas û hatina HTŞ, desthilata nû ya Şamê gelê Kurd ji ber sedemên cuda weke daxwaza gelê Kurd bi parçebûna ji xaka Sûriyê tewanbar kir. Siloganên hikumeta veguhêz hemû qadên civaka Kurd li Sûriyê û derveyî Rojavayê Kurdistanê aciz kir, êdî Kurd dibêjin "Em ê çawa bi civakeke wiha re jiyan bikin, em dibêjin aştî û lihevkirin, wekheviya netewan, yekîtiya gelan, diyalog, lê ew dibêjin agir û şer." Gelê Kurd nema baweriya xwe bi vê hikumetê û alîgirên wê tîne. Di heman demê de wê gelê Kurdî bi sedema kîndariya ku li ser tê meşandin, xwe dûrî vê hikumeta wê bixe. Gelê Kurd û QSD'ê di serdema rêjîma Baas de jî dibû hedefa reşkirinê, hikumeta Şamê ya têkçûyî bi zanebûn Hêzên Sûriyaya Demokratîk û gelê Kurd li pêşiya çavê tevahiya pêkhatiyên din dida reşkirin. Her tim dixwest agirê şerekî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi destê gelên wê pêxe û xwe vekişîne ji lîstika xwe ya qirêj. Lê pêkhateyên Sûriyê lîstika rêjîma Baas baş naskiribûn, lewma armanca rêjîma Baas pêknehat. Dema ku hikumeta HTŞ, artêşa Berevaniya wê û alîgirên hikumetê ji bo salvegera (Rizgarkirina Sûriyê) şahî dikir, hejmareke mezin ji leşkerên HTŞ û komên çete yên girêdayî wê di pêşandaneke leşkerî de axaftin li dijî Israîlê gotin, hem jî piştgirî dan Filestînê. Di heman rojê de Wezîrê Elşetat a Israîlî Emîhay Şêklî li ser heman bûyerê wiha got: "Şer û cenga me li dijî Sûriyê dê karekî tekez be, ji ber ku hin leşkerên HTŞ'ê di salvegera (Rizgarkirinê) axaftinên piştgirtiyê ji bo Xezayê dan." Axaftina Şêklî hişt ku tirseke mezin li cem hikumeta veguhêz û Berevaniya wê ava bibe. Tirs ji ber tunebûn û bidawîbûna hikumeta veguhêz hat avakirin, ji ber vê yekê jî Wezîr Wezareta Berevaniya Sûriyê Murhef Ebû Qesra bi dilekî tirsok derket û axivî: "Cihê tekeziyê ye ku Sûriyê xwedî helwesteke û tenê girêdayî mijarên hundirîn eleqedar dibe, destwerdanê di dewletên hawîrdorê de nake. Siloganên ku ji hêla hejmarek ji leşkerên artêşa me ve derbarê Xezayê hatin kirin, nûnertiya hikumeta Sûriyê û Wezareta Berevaniya Sûriyê nake. Ji bo vê mijarê jî lêpirsîn çêbû." Ev axaftin û lêbûrîn, wekî koletiya hikumeta HTŞ ji Israîlê re bû. Wekî tê zanîn, hikumeta HTŞ bi biryara Israîl û hin hêzên navdewletî hat li ser desthilatdariya Şamê da ku tevgera Îranê û Huzbullahê ji Sûriyê raweste. Piştî vê guhertinê êdî Israîl gefekê ji komên cîhadîst û HTŞ'ê bixwe dibe cihê nerazîbûna Israîlê. Em dibînin ku dema ku silogan li dijî Israîlê tên kirin, hikumeta veguhêz dikare gefan û agirê şer vemirîne, lê dema ku mijar dibe kîndariya li dijî QSD, gelê Kurd û tevahiya gelên Sûriyê, ew agirê şer gur dike. Ji dêvla ku HTŞ'ê mîrateya Baas a kîndariyê hilgire û mîna rêjîma beriya xwe têkbiçe, pêwîst e siyaseta kîn û nefretê bide rawestandin. Çareseriya Sûriyê ne bi kînê û zordariyê pêktê, lê belê bi diyalogê, aştî, edaleta civakî, hem jî xwerêvebirin û sîstema nenavendî dibe. Pêkanîna diyalogeke Sûrî ku tevahiya gelên Sûriyê tê de beşdar bibin û hemû alî hev bipejirînin, pêwîst e. Bi vî rengî heskirineke mezin di navbera tevahiya gelan çêdibe û welat ji vê kirîzê derdikeve. Avabûna Sûriyê bi heskirin, diyalog, demokrasiyê pêkan dibe. Divê jiyana hevbeş di navbera pêkhateyan de li şûna kîndariyê were çandin.



# 'Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e'

Rêvebera HPC-Jin ya kantona Firatê Zuleyxa Elî diyar kir ku Rêber Apo li ser mijara parastinê wiha dibêje; 'Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e' û got: "Xeterî û gef hîna jî berdewam in, lewra parastin ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê mîna av û nan girîng e."

**Viyan Egîd/Kobanê**

Hêza Parastina Cewherî (HPC) hertim ji bo rewşên awarte amadeye. Bi taybetî dema ku li dijî jin, zarok, ciwan, mêr û hemû endamên civakê êrişek rû bide dikeve tevgerê û wan diparêze. Civakek bê parastin civakek mirî ye, nikare xwe ji tu êrişên muhtemel yên ku rû bidin biparêze. Pergala parastina cewherî di her qadeke civakê de pêdiviyeke ku ne gengaze mirov dest jê berde, di heman demê de ewlehiya serkeftinên gel û civakê ye.
Di vê carcoveyê de Rêvebera HPC Jin ya kantona Firatê Zuleyxa Elî ji Rojnameya me re axivî.

### 'Civaka bê parastin, civakeke mehkûmî tunebuyinê ye'

Zuleyxa Elî di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku civaka bê parastin, civakeke mehkûmî tunebuyinê ye û wiha dewam kir: "Di jiyana hemî zindiyan de xwe parastin girînga, ji destpêka mirovahiyê û heya roja îro, tevahî jiyan I ser sê lingan hatiye meşandin, 1- xwe têrkirin. 2- xwe zêde kirin û 3- xwe parastin. Dema ku parastin tune be wê demê mirov texmîn dike ku jiyan jî hatibe raswistandin û tu kes lê ne neba. Ji ber eger mirov û tevahî xwezaya heyî xweparastin girîng nedîtiba û li hemberî êrişan xwe neparêze û nebe bersiv, wê demê ew civak wê mehkumî tunebûn, esmîlesyon û parçekirinê be. Ji ber vê yekê pêwîst e em xwe û civaka xwe ji her awayên êrişan bi parêzin, çi êrişên derve û hundir be. Maf û destkeftiyên ku rejîma Sûriyê û çeteyên wê di pêvajoya şoreşê de ji destê gel derxistibû, niha bi awayekî gelêrî tên parastin. Ji ber ku xetere û gef hîna jî berdewam in. Lewre parastin ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê mîna av û nan girîng e. Her wiha ji ber ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek ol û netewe hene ku di bin sîstemeke parastinê de kom bûn û nirxên xwe yên madî û manewî diparêzin. Bêyî parastina qirkirina bedenî, çandî û civakî di her kêliyekî de mimkun e."

### 'Civakeke ku nikaribe xwe biparêze, wê wateya xwe exlaqî û polîtîk winda bike'

Zuleyxa di berdewamiya axaftina xwe de balkişand ser girîngiya parastrinê û Rêber Apo parastin çawa dinerxîne û wiha got: "Rêber Apo li ser xweparastin wiha dibêje; 'Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e'. Ya rast civakeke ku nikaribe xwe biparêze, wê wateya xwe exlaqî û polîtîk winda bike.' Pêwîst e ku civak di hemû çavikên guncav de komên parastina cewherî pêk bîne û ev jiyanî ye. Civakên bê parastina cewherî, civakên ku ji tekelên sermaye û desthilatan re dîl ketine û hatine mêtandin. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne tenê di nav xwe de gelek tecrubeyên şoreş û serhildanên gelan ên cîhanê kom kirin, lê belê di aliyê fikr, rêxistin û îradeya gelan de şoreş û serhildanên cîhanê derbas kirin. Şoreşa Rojava tecrubeyeke demokratîk, pergalake civakî û parastineke hevgirtî bi destê gelan tê pêşkêşkirin. Ji birêxistinbûna gel a li gorî fikrê neteweya demokratîk û biratiya gelan a zemîna hevgirtina neteweyî û etnîkî danî heta siyaseteke demokratîk di projeya Rêveberiya Xweser a bêyî hilweşandina dewletê an guhertina wê bi desthilatdariyeke nû li ser gel. Ev tecrube pergaleke parastina cewherî ya rewa ji hemû pêkhateyên civakê ava dike û di nava ewqas salên aloziyê de nirx û destkeftiyên xwe parastin û ji xetereyên derve û kiryarên terorîst ên muhtemel li ser herêmê diparêzin."

### 'Dijmin bi rêya mediya dijîtal êrişî Kurdan dike'



Zuleyxa Elî da zanîn ku ew ji bo hemû gef û êrişên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê kirin amedene û wiha pê de çû: "Di nava 14`e salan û heya roja îro gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî hemî cureyên êrişan hatin, ev yek nehişt ku îradeya gel were şikandin, berovajî wê, ji zarok, jin, ciwan û kalên me xweparastin ji xwe re asas û girîng dîtin. Dema em behsa êrişên li ser me hatin meşandin û heya roja îro jî bi awayekî cûda ev êriş dewam dikin, wek ku tê dîtin û zanîn ku dijmin çawa ni rêya dijîtal mediya û malparan êrişî kurdan dike, ji ber vê yekî dema em dibêjin êriş û şer, tenê şerê çek û leşkerî tune ye. Lê belê bi rêya şerê taybet dixwazin civak û gelê me bide esmîlekirin, li hemberî vê yekê jî em xwe û gelê xwe perwerdekirin, rêxistinkirin û hişyakirina li hemberî van tevlîheviyan ew ê çawa bibin bersiv. Em ê şev û roj li ber parastina civaka xwe li ser piyan bin."

### 'Em di pêvajoyekê de ne ku ji hemû deman zêdetir parastin pêwîst e'

Rêvebera HPC Jin ya kantona Firatê Zuleyxa Elî di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku ew ê xwedî li banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk derkeve û wiha got: "Em wekî Hezên Cewherî yên civakê, hewledanên me heya dawî hene ku xwedî li banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk derkevin. Em di pêvajoyekê de ne ku ji hemû deman zêdetir parastin gereke, çi ji bo jinên kurd an jinên herêmê, xak an welat be û ji bo avakirina sîstemekî demokratîk. Sûriya niha bê parastin e tê wateya ku civak bi tevahî bê parastin e, divê ji her demê zêdetir mertalên xwe xurt bikin, ev jî bi rêxistinbûyînê û tevlîbûyîna hêza cewherî çêdibe, hêmanê hêza cewherî li ser esasê parastina rewa ye divê em paşguh nekin, xeteriyên mezin li pêşiya me hene ji bo rûbirûbûna van xeteriyan gereke em hêza xwe ya cewherî pêşixin û bi çanda gulê em nêzîk bibin ku bi stiriyên xwe xwe diparêze."

# 'Binpêkirina zagonên tirafîkê rê li pêşiya qezayan vedike'

**Berçem Silêman/ Dêrik**

**Rêveberê Navenda Tirafîkê ya bajarê Dêrikê Rêzan Ehmed diyar kir ku binpêkirina ji zagonên tirafîkê re rê li pêşiya qezayên tirafîkê vedike û got, "Sedema sereke ya qezayên tirafîkî leza zêde û binpêkirina zagonên trafîkê ye."**

Di sala 2014'an bi awayekî fermî navendên tirafîkê li herêma Cizîrê hatin avakirin û bajarê Dêrikê yek ji wan bû. Di navenda bajarê Dêrikê de 28 endamên tirafîkê û 15 endamên ewlehiyê cihê xwe digrin û kar û xebatên tirafîkê didin meşandin. Herwiha di navenda Tirafîkê ya bajarê Dêrikê de gelek ofîs hene wek ofîsa aborî, dîwan, ofîsa tor û agahdarî, ofîsa rezervasyon û ofîsa qeydkirina qezayan. Di derbarê kar û xebatên tirafîkê li bajarê Dêrikê Rêveberê Navenda Tirafîkê ya bajarê Dêrikê Rêzan Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

### 'Tirafîk ji bo xizmet û parastina gel e'

Rêzan Ehmed da zanîn ku Navenda Tirafîkê a bajarê Dêrikê destpêkê bi derfetên herî kêm dest bi kar kir wiha got: "Destpêkê me bi 6 kesan dest bi kar kir, ji ber ku tirafîk nû hatibû avakirin di bajar de astengî derdikatin pêşiya me. Gel nerazîbûna xwe nîşan dida ku wê çawa Tirafîk li kolanan bi sekine û daxwaza kaxezên erebeyan bike û kesên ku zagonên Tirafîkê binpê dikin wê werin cezakirin. Lê bi demê re hinekî qebûlkirin çêbû niha akadimî, saziyên fermî û perwerdeyên tirafîkê çêbûne. Şev û roj endamên tirafîkê li kolanan in û karê xswe disdin meşandin. Her binpêkirinek buhayê wê cûdaye, kesê ku nasnameya xwe ya ajokariyê jibîr kiribe em ceza 15 hezaran jê distînin çi erebe çi jî matorê wî li gel me dimîne heya ku nasnameya xwe bîne, lê kesê ku nasnameya wî ya ajokariyê nebe 50 hezar cezaye û 3 rojan erebeyan matorê wî li gel me dimîne. Di heman demê de radar li ser rê heye kesê ku ji 106 leztir bajo radar wî digre û ceza 20 hezarî jê distîne. Gelek kes hene rexneyê me dikin û nerazîbûna xwe nîşan didin li ser zagonên tirafîkê, hîn neketine wê ferqê de ku tirafîk ji bo xizmeta û parastina gel e. Erkê me ye ku em zagonan pêk bînin da ku tevlîhevî di bajar de çênebe."

### Astengiyên ku derdikevin pêşiya Tirafîkê

Rêzan Ehmed berdewamî da axaftinên xwe û wiha got: "Tişta ku dibe asteng li pêşiya me û li pêşiya gel ajokarên temen piçûk û ajokarên ku erebeyan bi lezeke zêde diajonin. Tevî ku em hemû hewildanên xwe dikin ku rê li pêşiya vê yekê bigrin, lê ew cezayên mezin nînin ku bibe asteng li pêşiya ajokar û zagonan binpê nekin. Di heman demê de fêmekirina erebeyan jî dibe asteng li pêşiya me her cara ku em ji erebeyan jêdikin careka din vedigerînin. Berî demekî em bi hemleyekî rabûn çi kesê ku fêmê ji bo erebeya xwe danî yan ronahiya spî bi erebeyan ve heyî me ew ceza dikirin û nêzî 500 ronahiyî me ji erebeyan vekir, armanca me ji van hemleyan belavkirina aramiyê di bajar deye. Ji ber ku gelek kes hebû sedema van ronahiya spî dihêlişt ku kesê beramberî wî rastî qezaya tiraîkê were."

### Deriyê navenda tirafîkê ji rexneya re vekiriye

Rêveberê Navenda Tirafîkê ya bajarê Dêrikê Rêzan Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha got:



" Îsal nêzî 310 qezayên tirafîkê çêbûne, sedema van qezayan jî ajotina bilez û ajokarên temen piçûk in. Hêviya me ew e ji ajokaran ku zagonên tirafîkê pêk bînin û di navbera erebeya xwe û ya li pêşiya xwe ji kêmanî mirtek valehî hebe da ku di demsala zivistanî de qezayên tirafîkê çênebe û zirar negihêje tu kesî. Daxwaza me ji desteya hundirîn û rêveberiya giştî ew e ku buhayê cezaya bilind bike da ku gel neçar bibe zagonan pêk bîne û rê li pêşiya qezayên tirafîkê were girtin. Navenda tirafîkê deriyê wê ji hemû rexne, pêşinyar û gazinên gel re vekiriye"